

W

ezîrê Karê
Hundirîn

Meraî Akşener bi fer-
manekê dixwaze ku li rê
ber saziyên lêkolînî yên
kurdî bê girtin, da ku
zimanê kurdî nebe zimanê
xwendin nivîsandinê. Li
aliyê din Wezîriya
Perwerdehiya Neteweyî
dixwaze li bajarên
Kurdistanê dibistanên
berîxwendinê (anaokulu)
veke, da ku zarokên ku
naçin dibistanê hînî tirkî
bibin.

Li serî vê helwesta dewletê
lêpîrsînek çêkir. Berpîrsên
saziyên kurd demokrat,
didin zanîn ku ev polîtîka
wê têk biçe, lewre digel
hemû astengiyên zimanê
kurdî bi taybetî piştî
weşanên MED-TV gavan
berbiçav bi pêş de avêtine.

RÛPEL 3



Kes nikare kurdan bihelîne!

● **Hunermendê kurd Mehmûd Ezîz bi HELÎM YÛSIV re li ser jiyana xwe û hunermediya kurdî peyivî.** Rûpel 8-9

● **METÎN AKSOY bi sernavê "Jin bi şoreşê digihîjin mafên xwe" li ser "Roja Jinên Kedkar" nivîsî** Rûpel 16

● **MÎRHEM YÎÇÎT bi nivîsa xwe ya bi navê "Îsa Şans" şexsiyetekî kurdê yê heja bi nîfşên nû dide nasîn** Rûpel 11

NAVEROK




11

Ferec Çobanoğlu: NÇM ya İzmirê bû dusalî



12

Raif Yaman: Heft çivîkên çiyayî



13

Eznas Maya: Jujin peyveke çêkirî ye lê mebest ne jineke çêkirî ye

Ji Xwendevanan

GELÎ hevalan karê ku hûn dikin gelek hêja û giranbuha ye. Zimanê kurdî re pir xweş e. Bi taybetî bi derketina weşanên kurdî me bi hêztir ji zimanê xwe hez kir. Ji ber ku xwendin û nivîsandin bi zimanê me jî dibû. Ez ji zû de bi derketina rojnemaya Welat bi vir de, bi kurdî dixwînim û dinivîsinim. Li ser vê yekê biranîneke min heye.

Rojekê apê min ji min re got: "Ka bîne ji me re Welat bixwîne." Li cem me jî pismamê me yê ku berê qoricî bû, hebû. Dema min Welat xwend, pismamê me şaş û metel mabû li min mêze dikir. Pir neçû û bi hêrs got: "Ê Mîrze malmirat! Ma tu nabîni ew li ser dinîhêre, lê naxwîne, ew fikrê xwe ji me re dibêje. Qey hûn nizanin nivîs bi kurdî dibe?"

OSMAN SERHED/ GÖZTEPE

Li ser navê keçikên kurd ji we re zor zor spas dikim. Xebatkarên hêja, daxwaziyeke min ji we heye. Ji ber ku jina kurd bi sed salan koletiya koleyan kiriye, çavên wê kor, zimanê wê qut kirine. Tim di bin fermana mêran de jiyaye. Lê belê, ev ne qeder e. Ger jina kurd bixwaze û li hemberî vê bêrûmetiyê serê xwe rake, wê dengê jina kurd bilind bibe. Pêwist e neyê jibîrkirin ku Besê, Zekiye, Rewşen, Zilan, Bêrivan û Ronahî jî jinên kurd in.

Min dibistan nexwendiyê. Ez bi saya hevalekî fêrî xwendin û nivîsandina bi kurdî û tirkî bûme.

SOZDAR BÊMAL/ TARSUS



Şûrê MGK'ê Xoce

SAMI TAN

Gotinên pêşiyên ji aliyê wateyê ve têrtijî ne. Lewre pêşiyên me piştî tecrûbeyên sedsalane gihîştine bîr û baweriyekê û bi awayê herî xweşik ew raman anîne zimên. Pêşiyên me dibêjin ku "Kurmê darê ji darê ye", an jî "Ku kurm ne ji darê be, dar nakeve."

Tecrûbeyên me kurdan di vî warî de gelek in. Çi wextê ku dijminên me ketine tengasiyê, li hemberî tevgera azadîxwaz a kurd dest avêtine şûrê kevnare, yanê kesên xayin. Di Serhildana Berdirxan Beg de Yêzdîn Şêr Beg, di Serhildana Dêrsimê de Rayber, du mînakên berbiçav in. Her wiha bi dehan êl û eşîrên alîgirê dewletê di gelek serhildanên kurdî de bûne egereke têkçûnê.

Dewletên serdest, bi taybetî ji dewletên tirk (çi osmanî, çi jî kemalî) di vî warî de gelekî şareza ne. Bi çend kes û eşîran qîma xwe neanîne, li ser vê bingehê rêxistin ava kirine, wekî Alayên Hemîdî û niha jî birêxistina çehşan ango cerdevanan.

Dewleta tirk ne bi tenê li dijî kurdan ev taktîk bi kar aniye. Li dijî hemû hêzên muxalîf dest avêtiye vê çekê. Di wan rojên ku ji Yekîtiya Sovyetê alîkariyeke mezin distand de, kemaliyan 15 endamên Partiya Komunîst a Tirkiyeyê (TKP) yê bijare di Bahra Spî de xeniqandin. Li vir gotineke birêz Yalçın Küçük tê bîra min ku gelekî balkêş. Prof. Küçük di pirtûkeke xwe de dibêje: "Çi dema ku tîkiliyên dewletê bi Yekîtiya Sovyetê re baş dibûn dewletê li dijî hêzên sosyalîst dest bi cerd û operasyonan dikir."

Sosyal demokrat, wekî kurmên nava tevgera sosyalîst tîn binavkirin. Lewre jî dewletê xwest di sala 1991'ê bi riya SHP û CHP'ê tevgera sosyalîst xelas bike. Di dema koalîsyona DYP û SHP'ê de êrîş û qetlîamên mezin li dijî gelê kurd û tevgera sosyalîst pêk hatin. Bi dehan şervanên rêxistinên sosyalîst bi destê polîsan hatin kuştin. Gelekên wan jî hatin windakirin.

Niha jî dewletê şûrê RP'ê xistiye

destê xwe û diajo ser hêzên îslamî. MGK'ê pêşî xwest ku Partiya Refahê bi her awayî teslîm bigire. Ew daxwaza xwe bi hêsanî pêk anî. Kesên oldar ên di nava artêşê de bi înzeya Erbakan Xoce ji nav refên artêşê hatin avêtin. Niha jî dixwaze qanûnên li dijî îslamiyan yek bi yek bi RP'ê bide derxistin. Di civîna MGK'ê ya 28'ê reşemiyê de ev qanûn dan ber Xoce, wî hinekî li ber xwe da. Piştî çend rojan ku hinekî lê sor kirin, înzeya xwe da.

Divê bê gotin ku ev taktîk ne tenê zirarê digihîne hêzên ku wekî hedef hatine hilbijartin, hêz û kesên ku di destê dewletê de bûne şûr û mertal jî derbeyeke mezin xwarin. Berdêla vê xizmeta ji dewletê re bi jiyana xwe didin. Bi dehan xayîn piştî ku karê dewletê pê qediyaye hatine kuştin. Rewşa siyasî ya CHP'ê li rastê ye. Ji aliyê siyasî ve, mirî ye. Piştî ku MGK'ê daxwaza xwe anî cih wê Partiya Refahê jî bikeve heman rewşê.

Xwendevanên hêja, xebatên me yê ji bo pêkanîna daxwazên we didomin. Wekî destpêk emê ji vê hefteyê pê ve di rûpel 15 de cih bidin ferhengokê. Daxwazên din ên ku ji anketê de derketine jî li gorî derfetên xwe emê pey der pey di rojên pêş de pêk binin.

Xwefedayî û jiyan

EHMED HUSEYÎN

Ser, ji bo zelalkirina rastiyeke an jî ji bo tarîkirina rastiyeke tê meşandin. Ji ber ku şer, rastiya civa-ka çînî ye. Ev rastiya hanê, her dem bi dijiwariyê hatiye meşandin. Çawa ku agir bi ardû geş û gur dibe, wisa jî şer bi bawerî û zanabûna mirov tê geşkirin. Lewre taktîkeke serkeftî, an jî livbaziyeke girîng û xurt ku bersiva qonaxê dide, bi xwe re tirseke mezin dixwe nava dijmin, mêtîyê neyar diçeliqîne û hemû taktîkên şerê psikolojîk û taybet bê tesîr dike.

Livbaziyeke girîng û xurt ku bersiva qonaxê dide, bi xwe re tirseke mezin dixwe nava dijmin, mêtîyê neyar diçeliqîne û hemû taktîkên şerê psikolojîk û taybet bê tesîr dike. Livbaziyeke girîng û xurt ku bersiva qonaxê dide, bi xwe re tirseke mezin dixwe nava dijmin, mêtîyê neyar diçeliqîne û hemû taktîkên şerê psikolojîk û taybet bê tesîr dike. Livbaziyeke girîng û xurt ku bersiva qonaxê dide, bi xwe re tirseke mezin dixwe nava dijmin, mêtîyê neyar diçeliqîne û hemû taktîkên şerê psikolojîk û taybet bê tesîr dike.

Piştî ku Îsraîl bi şerê pûşpera 1982'an

Hevala Zilan bi livbaziya xwe, jin kirin jin û wê ew bi jiyan kirin. Vê livbaziyeke riya azadiyê, nîşanî jina kurd da û her wiha nîşanî cihanê da ku çawa rastiya gelê kurd hatiye.

re dagirkeriya xwe li ser başûrê Lubnanê danî, keç û xortên Lubnanê tevî Filistinî û Sûrî dest bi livbaziyeke xwefedayî kirin. Leşkerên Îsraîlê jî berî ku livbaziyeke întixarî dest pê bikin, wisa bawer dikirin ku tu hêz nikare wan ji Başûrê Lubnanê derxîne. Yaser Arafat îxanet kir, dîsa jî îsraîliyan leşkerê xwe ji nav erdên Filistinayan gavek bi paş ve nekişandin. Lê gava livbaziyeke xwefedayî pêk hatin, Îsraîlê leşkerên xwe 30 km'î bi paş ve kişandin. Ji ber ku ji hemû welatên ereban keç û xortan berê xwe dane Lubnanê, ji bo ku livbaziyeke xwefedayî pêk binin. Hemû teknolojiya Îsraîl, Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê û Ewropayê nikaribûn bibûna asteng li ber livbaziyeke wan. Çiqas leşker dihatin kuştin, ji wê bêhtir tirseke mezin di nava leşkeran de çêdibû. Dîsa mirovê ereb yê ku yekî ji yekê din hez nedikir, bi livbaziya İbtisamê Hemîd û yê din, ji aliyê rihî ve yekîtiyek pêk anî. Belê wan livbaziyan hêza emperyalîzmê ji binî ve hejand.

Gava mirov li livbaziyeke wan keç û xortên lubnanî mêze dike, dibîne ku, bê wan livbaziyan ne gengaz bû ku artêşa Îsraîlê ji başûrê Lubnanê vekêşe.


Niha jî em werin ser livbaziyeke bi vî rengî yê şervanên kurd. Hevala Zilan jî sedema livbaziya xwe wisa dida xuyakirin: "Dijmin bi awayekî giştî bi ser me de tê, êrîş me dike. Pêwist e ku em jî, bi hemû hêzên xwe bi ser dijmin de herin û em bi dijmin bidin hîskirin ku em bi biryardarî û bi bîr û bawerî berdêla azadiyê didin û xwe di vî riyê de feda dikin." Hevala Zilan bi livbaziya xwe, jin kirin jin û wê ew bi jiyan kirin. Her çiqas livbaziyeke wan ku li welatên din bûne û livbaziya hevala Zilan di şêkil de hinek aliyên hevpar hebin jî, di cewher de hinek cudahî hene. Mînak wê livbaziyeke riya azadiyê nîşanî jina kurd da û her wiha nîşanî cihanê da ku çawa rastiya gelê kurd hatiye guhartin.

Di encamê de mirov dikare bibêje hevala Zilan çiqas ku ji mirovahiyê û ji gelê Rojhilat û Kurdistanê re bû mînak di hêla moral, bawerî û cengawerî, hezkirina ji jiyaneke rast û azad de, ew qas jî, riya azadiyê hînî jinên Kurdistanê kir. Yanê pêwistî bi azadiyê û xwedî derketina li cinsiyeta xwe tê ditin. Mesaja Hevala Zilan ji civata mirovatiyê re fermana diroki ye û riya xelasiya di roja me ya îroyîn de, ew bi xwe ye.



WEKÎ tê zanîn Weqfa Çand û Lêkolîna Kurdî (KÛRT-KAV) sala çûyî bi mebesta ku li ser zimanê kurdî xebat û lêkolîna pêk werin, hatibû avakirin. Weqfa Çand û Lêkolîna Kurdî di meha avrêlê de wê êdî dest bi dayîna dersên zimanê kurdî bikin. Wê ew ders bi zaravayên kurmançî û dimîlî bêne dayîn.

Li gorî sewiyeya xwendevanan wê sinifan amade bikin û sinifên wan wê ji du beşan pêk were; yê li ser dersên pratîk û yê li ser dersên gramatik. Rêvaberên weqfê serî li Wezîriya Perwerdehiya Neteweyî dabûn ku dersên zimanê kurdî bi awayekî fermî bêne dayîn. Lê tu encam ji wê serlêdanê jî nestandibûn.



Di roja 02.03.1997'an de polisên Daîreya Têkoşîna bi Terorê re, êrişî ser Navenda Çanda Mezopotamyayê Şaxa Edeneyê kirin. Xebatkarên NÇM'ê tehdît dikin ku ew çareke din neynê sazîyê û xebatên xwe pêk neynin. Li ser vê yekê ji ravedarên NÇM jî wê bûyerê şermazer kirin.

Li aliyê din 06.03.1997 de polisên Emniyeta Stenbolê yê Daîreya Têkoşîna bi Terorê re êrişî şer Navçeya HADEP'ê ya Avîlîlarê kirin. Serokê navçeyê Mehmet Toğuş, ji endamê reveberiya navçeyê Ömer Karadağ û du kesên din girtine bin çav. Sekreterê HADEP'a Stenbolê Cemal Çoşğun ev êriş şermazer û berdana kesên ku hatine girtin xwest.

NÛÇE

Kes nikare kurdan bihelîne!



SEDAT YURTDAS

Berî du heftiyên di Rojnameya Demokrasiyê de fermaneke Wezîrê Karê Hundirîn Meral Akşener derket. Di vê fermanê de dihat xwestin ku li rê ber sazîyên lêkolînî yê kurdî bê girtin, da ku zimanê kurdî nebe zimanê xwendinê nivisandinê. Her wiha roja 28'ê reşemiyê di rojnameya Radikalê de nûçeyek derket. Li gorî vê nûçeyê Wezîriya Perwerdehiya Neteweyî dixwaze li bajarên Kurdistanê dibistanên berxwendinê (anaokulu) veke, da ku zarokên ku naçin dibistanê hînî tirkî bibin. Di nûçeyê tê gotin ku li Kurdistanê zimanê tirkî hêdî hêdî girîngiya xwe winda dike. Sedema bingehîn a vê yekê wekî MED-TV tê nîşandayîn. Me li ser helwesta dewletê li hemberî zimanê kurdî û pêşeroja zimên bi berpîrsên sazîyên kurd û demokrat re lêpîrsînek çêkir. Em bersivên van pêşkêşî we dikin.

Cigirê Serokê Giştî yê HADEP'ê Sedat Yurtdaş

Heke zimanê kurdî ji holê rabe wê gelê kurd jî ji holê rabe. Ji ber vê yekê dewlet dixwaze kurdan asimîle bike. Lê dewlet nikare vê daxwaza xwe pêk bîne. Lewre jî îro şûn de asimîlebûna kurdan ne mimkûn e. Zimanê kurdî hêdî hêdî bi pêş dikeve. Piştî 600 salî Quran li kurdî hate wergerandin. Klasîkên edebiyata dinyayê li kurdî tîn wergerandin. Li gorî pêwîstiyên hemdemî jî zimanê kurdî bi pêş ve çûye. Îro weşanên MED-TV li derarşîvan de cihê xwe digirin. Ez ji bo pêşeroja zimanê kurdî gelek bihêvî me.

Dewlet dixwaze bi dibistanên berxwendinê (anaokulu) zarokên 3 salî asimîle bike. Ji sedî 53'yê zarokên di navbera 5-11 saliya xwe de li kuçeyên

Derdorên kurd bi giranî didin zanîn ku, ziman ji bo nasnameya neteweyî hêmaneke bingehîn e. Lewre jî dewlet dixwaze kurdan asimîle bike. Ev politîkayên dewletê wê bi ser nekevin. Di pêşketina zimanê kurdî de rola MED-TV zêhf e. Lê hinek rewşenbîrên kurd bi xemsariya xwe ya li hemberî zimanê kurdî, karê dewletê hêsan dikin.

Amedê tazî û birçî digerin, dewlet çima li wan xwedî dernakeve?

Hasan Kaya (Enstituya Kurdî)

Bi rastî jî dewlet ji pêşketina zimanê kurdî ditirse, dixwaze pêşiya wê pêşketinê bigire. Ji ber ku zimanê neteweyî ruh û mêjiyê mirov e, neteweya bêziman, mêjiyê xwe winda dike. Politîkayên dewletê bi ser nakevin. Lewre berê beqçeyekî ku bi tirkî dipeyivî ji doktorekî ku bi kurdî dipeyivî biqîmetir bû. Lê niha ne wisa ye. Ji bo ku rê li ber politîkayên dewletê bê girtin, divê tevgera azadiyê hîn xurt bibe, bi vê yekê re sazîyên me yê neteweyî jî xurt bibin.

Hüseyin Yıldan (NÇM)

Bindestkirina neteweyan bi bindestkirina çand û zimanê wan gelan dest pê dike. Tevî ev qas zilm û zordariyê agirê berxwedanê di dilê kurdan venemiriyê, di warê zimên de gavên baş tîn avêtin. Dewlet ji van pêşketinan ditirse. Êdî dawî li heyama asimîlasyonê hat. Bi saya MED-TV'yê zimanekî standard çêdibe. Dewlet ji bo zarok pêşeroja civakê ne dexwaze wan bixe bin bandora xwe.

Ahmet Önal (Nûjen)

Di warê pêşketina zimanê kurdî de MED-TV gaveke girîng. Dewlet dixwaze pêşiya wê pêşketinê bigire. Her çiqas welat bi zora dewletê vala bibe jî, ez bi xwe ji pêşeroja zimanê kurdî hêvîdar im. Me berê bi kurdî pirtûkek nedidît. Lê îro pirtûk û rojname derdikevin. Zarok hînî xwendina bi kurdî dibin. Divê kurd yekîtiya xwe ava bikin, parçeyên din ên welêt ziyaret bikin, li televizyona kurdan temaşe bikin û di mala xwe jî bi kurdî bipeyivin.

Süleyman Çevik (Nûbihar)

Milet bi zimanê xwe hene û kurd jî bi zimanê xwe kurd in. Dewlet ji zimanê kurdî ditirse, çimkî ew kurdan ji wan cihê dike. Her çiqas her tişt li dijî me be jî ez ji pêşeroja zimanê kurdî hêvîdar im. Ev ne karekî 4-5 salan e, encama van xe-

batan piştî 40-50 salî xuya dibe. Pênc salan berê ji bo rastkirina kurdî tu kes nîn bû. Niha em gelek in.

Yılmaz Çamlıbel (Kürt-Kav)

Li gorî lêkolînen zanistî kesayetiya mirovan di navbera 0-6 saliyê wan de pêk tê û bere bere teşe digire. Ji aliyê derûnî ve zimanê zikmakî bandoreke rast rast li ser vîn û daxwaza kesana jî bo fêrbûnê dike. Ji bo ku vîn û daxwaza fêrbûnê ji zarok re çêbe, pêwîst e ku we bi zimanê xwe yê zikmakî perwerde bibe. Dewlet dixwaze pêvajoya pişaftinê berî dibistanê bide destpêkirin.

Zimanê biyan wekî virûsê ku dikeve komputerê ye. Bi wî zimanî zarok gejjî dibin. Zarokên herî jû û jêhatî dibin kor-fêhm. Her zimanek kesayetiyeke cûda pêk tîne. Mirovê ku bi tirkî perwerde dibê wekî tirkan difikire. Digel hemû tiştî jî ez ji pêşeroja zimanê kurdî hêvîdar im û bawer nakim ku politîkayên dewletê bi ser bikevin.

A. Zeki Okçuoğlu (Doz)


Ez kirinên dewletê fêhm dikim, lê kirinên rêxistinên ku li ser navê kurdîyê xebatê dikin, fêhm nakim. Bi dîtina min li hemberî zimên helwesta dewletê û rêxistinên kurdan wekî hev e. Her du jî politîkaya asimîlasyonê dimeşînin.

Dewletê di şerê li dijî kurdan de pêşî dest avêt zimên. Ji ber ku karakterê kurdan bi zimanê wan qaîm e. Cûdahiya me zimanê me ye. Ji ber ku dîne me û yê tirkan yek e dewlet baş dizane ku zimanê kurdî ji ortê rabû, kurd jî namînin.

Pêşketina herî girîng a van salên dawî MED-TV ye. Lê ew jî bi giranî cih dide rêxistineke kurdî û serokê wê. Rewşa zimên bi piranî girêdayî helwesta kurdan e. Li dijî zimanê kurdî têkoşîneke pir cidî ya dewletê heye. Heke em hay ji zimanê xwe nebin, emê jî wekî îrandî û korbîkayîyan bibin.

Tayfun İşçi (Eğitim-Sen)

Gel MED-TV hembêz kir, dewlet jî wê ditirse. Nebûna perwerdehiya bi zi-



YILMAZ ÇAMLIBEL

manê zikmakî kesayetiya zarokan dirûxîne. Mirovên bêhawa û kesayetiyan şikestî derdixe holê. Ji ber ku dewlet mirovên wisa dixwaze, zimanan qedexe dike. Em dixwazin hemû gelên ku li Tirkîyeyê dijîn (kurd, laz, ereb, çerkez, ermenî, gürçî, abaza...) bi zimanê xwe bîn perwerdekirin.

Abdullah Keskin (Avesta)

Çiroka zimanê kurdî çirokeke trajî-komîk e. Di navbera salên 1925-1970'î de li Tirkîyeyê bi kurdî berhemek derneketiye. Ez bawer nakim ku tiştêkî wisa hatibe serê tu miletên din. Asimîlasyon berî cumhuriyetê jî hebû, lê nekariye tiştêkî bike. Rast e, ji ber politîkaya asimîlasyonê zimanê kurdî xera kir, lê kurdan pê re zimanê tirkî jî xera kirin.

Qedexeya li ser zimên bêmane ye û nikare rê li ber têkoşîna kurdan bigire. Lewre siyasatvanên kurd bi zimanê tirkî dest bi siyasatê kirine. Hişyarbûna siyasî bi zimanê tirkî pêk hat. Îro kurdên ku hîç bi kurdî nizanin, kurdên ku li metropolan mezin bûne bêhtir dixwazin hînî zimanê kurdî bibin.

Di warê pêşketina zimên de kêr bin jî hin gav hatine avêtin. Lê li gorî wela-tên din li kurd pir li paş mane. Ji Başûr bibliyografek hat, li gorî wê di nav 200 salî de li her çar parçeyên Kurdistanê 1100 kitêb hatine çapkirin.

Dawiya dawî çareserî girêdayî dewletbûnê ye. Lê tiştên ku em îro bikin jî gelek in. Heke em îro van tiştan nekin, wê sibe li me dereng bibe. Îro qedexeya herî mezin a di serê kurdan de ye. Li ser zêde kurdî zora dewletê zêde nîn e. Hinek ronakbîrên me bi xwe kurdî li xwe qedexe kirine.

MAZLUM DOĞAN

Zimanê yekgirtî yê rojnamegiriya nûjen

Parçebûn û bindestiya gelê kurdê li ber yekîtiya zimanê kurdî girtiye. Lewre di warê rojnamegeriyê de jî zimanekî yekgirtî pêk nehatiye. Lêgerînerê zimanê kurdî yê amerîkî MICHEAL L. CHYET ku bi xwe jî di Radyoya Dengê Amerîkayê Beşa Kurdî de dixebite û li Enstîtuya Kurdî ya Washingtonê dersên zimanê kurdî dide, li ser vê mijarê nivîsek nivîsiye. Me ev nivîs ji Internetê wergirt û SAMÎ BERBANG ew ji inglîzî wergerand zimanê kurdî.

Ji ber ku welatê kurdan di navbera çar dewlatan de (Tirkiye, Îran, Iraq û Suriye) hatiye parçekirin, kurdên di bin destê her dewletê de di bin bandora çandî û zimanekî cihê de mane. Ew jî pêkanîna zimanekî yekgirtî (standard) yê nivîskî dike karekî pir giran. Bêyî ku tê derxin ka çi dikin, kurdên Suriye û Iraqê dest pê kirin (ji ber pergala perwerdehiyê ya ereban) peyv û qalibên erebî xistin nava axaftina bi kurdî. Kurdên Tirkiyeyê û Îranê jî yên tirkî û farisî xistin nava zimanê

û kurdên Tirkiyeyê ew kirine Poloniye. Xuya ye ku ji bo radyoyeke wekî Dengê Amerîkayê Beşa Kurdî mimkûn e ku ew pîrnaviya cihên cografîk were pejirandin. Li şûna wê, em hewl didin ku navekî

standard bêtir destnîşankirin. Ji ber ku

kurdên Tirkiyeyê ji aliyê hejmarê ve pirtir in, bi mebesta ku em xwe bigihînin zêdetirîn guhdaran formên Awistiryê û Poloniye hatiye neqandin. Tevî ku ji aliyê teorîk me dikaribû yek ji wanên din jî bipejiranda. Pîrî caran em dibêjin Poloniye ango Lehistan an jî Awistiryê yanê Nems. Pêşî em forma standard pişt re jî awayên din dibêjin. Em hevî dikin ku formê standard cihê xwe bigire û em jî, ji vê zehmetiyê riha xelas bibin.

Di nava tekstê de go-

tinên raveyî bi tenê carekê ten bikaranîn, pişt re her tim forma standard tê gotin. Heta pergaleke hevotînê ya yekgirtî û saziyêke desthilatdar a navendî ku piştevanîya vê cudatîyê dike hebe, (wekî Beşa Kurdî ya Dengê Amerîkayê) wê hewlên me yên ji bo yek-kirina zimên encamên durrî daxwazê bidin. Heta derfetê didin, bi ragihandina peyvên ku di weşanên kurdî de tên bikaranîn, em diwaxazin di warê yekgirtina zimanê nivîskî de hin gavên avêtin.

Mijareke din peydakirina hinek peyvên rojnamegeriya nûjen ên mîna "interview" û "candidate"ê ne. Ji ber ku divê em xwe bigihînin teknîkeke zanistî ya çêkirina peyvên, tê xwestin ku em bala xwe bidin zimanên din ên gelên Rojhilata Navîn; bi taybetî jî erebî û farisî û tirkî, her wiha jî ermenî û îbrânî. Da em bibînin ka qalibekî hevpar ê ku ew gişt pê kar dikin heye an tu-

ne ye. Ji ber ku em dix-

wazin di çêkirina a peyveke nû ya kurdî de ji wî qalibî sûtê wergirin. Di warê peyva "interview" de ew qalib bi dest dikeve. Peyvên erebî, farisî û tirkî gişt xwediyê mantiqekî hevpar in. Peyva ku di erebî de cihê "interview"ê digire "mûqabele" ye. Farisî jî dîsa peyveke erebî "mûsâhabah" bi kar tînin. Tirkan peyva "mûlâqah" kirine "mûlâkat" û pê kar dikin. Her wiha peyva nû "söyleşi" û peyva fransî röpörtaj jî ji layê tirkan ve tên bikaranîn. Dema mirov bala xwe dide sê peyvên erebî mûqâ-

bele, mûsâhabah, mûlâqah her sê jî xwediyê mantiqekî hevpar in. Mûqabele navdêreke lêkerî, awayê sêyemîn e û tevgera ku du kesan eleqedar dike, dinimîne. Di eslê xwe de mûqabele hevdiîna du kesan a rû bi rû ye. Peyva mûsâhabah jî hevalbûn, axaftina dostane bi hev û din re tîne zimên. Li aliyê din mûlâqah tê wateya hevdiîna du kesan. Dîsa peyva tirkî ya nû "şöyleşi" ku bi parkîta "-ş"yê hatiye çêkirin, tê wateya axaftina du kesan bi hev re. Peyva "söylemek" gotin e, "söylemek" jî hev re gotin e û ji lêkerê "söylemek"ê tê.

Tê dîtin ku li vir qalibek heye: "Mirov digel yekî din karekî dike". Li vir karê ku tê kirin peyvî e. Pîrsa din ev e; mirov dikare vê rewşê çawa bi kurdî bîne zimên. Bextê me yê xweş, peyva herî belavbûyî ya ku di kurmançî ya nûjen a nivîskî

tê bikaranîn bersiveke xweş dide vê pîrsê. Farisî pêrkîta "hem-" bi kar tînin ji bo tevgera ku du kesan eleqedar dike. Bo nimûne hemvatan ji bo welaî tê xebitandin. Di kurmançî de beramberî vê pêrkîta "hev-" di soranî de "haw-" heye. Peyva ku di kurdî de cihê "interview"ê digire "hevpeyvîn" e. Ji pêrkîta "hev-" û lêkerê "peyvîn"ê pêk hatiye. Mirov dikare vê peyvê di her rojname û kovara kurmançî de bibîne.

Peyveke din ku di heman wateyê de bi berfirehî tên bikaranîn "çavpêkeftin" a bahdînanî an jî "çavpêkewtin" a soranî ye. Dahûrîna peyvê "çav (çaw)" + pêk (bi êk) + keftin (kewtin). Yanê kesê ku çavê mirov pê dikeve. Gengeşiya ku li ser vê peyvê çêdibe ev e: Divê ev peyv bi tenê ji bo hevpeyvînên rû bi rû bê bikaranîn. Lewre kesên ku bi rîya telefonê hevpeyvînê dikin, hev û din nabînin. Lê dema mirov li ser vê dîtinê biçê, divê ji bo peyva "interview" a inglîzî ku ji pêrkîta "inter-" (navber) û peyva "view" (ji "veua" fransî tê û wateya wê jî dîmen e) pêk hatiye jî heman tiştî bibêje. Digel ku di inglîzî de pêdiviyêke bi vî rengî tune jî, di soranî de du peyvên ku ji bo hevpeyvînên bi rîya telefonê tên kirin, hene: "Wutûwêj" û guftûgo. Ev her du peyv jî di binyada xwe de tên wateya gengeşî û nîqaşê.

Di kurmançî de ji bo "candidate" an "nominee"yê çar peyvên cuda tên bikaranîn. Ew bi tenê nimûneyeke rewşa giştî ye. Ji ber ku di navbera kurdên ku li Tirkiyeyê bi tîpên latînî weşanê dikin û hevpeyvîyên min ên di Dengê Amerîkayê Beşa Kurdî de (bi piranî kurdên Iraqê ne û bi al-

fa-beya erebî kar dikin) dan û standineke xurt nîn e. Di navbera peyvê ku ew bi kar tînin de jî nêzîkiyek nîn e. Peyvên ku di soranî de tên çêkirin rewşê aloztir dikin. Li gorî min heke ji bo tiştêkî çar peyv hatibin çêkirin, divê êdî mirov dev ji çêkirina peyvên berde.

Çar peyvên ku di kurmançî de hatine çêkirin: Berendam, berbîjar, navkîrî û namzet in. Mirov dikare van bike du biran. Bîrek (berendam, berbîjar) jî

welat

welatê me

WELAT

wan bi alîkariya pêrkîta 'ber-'ê hatiye çêkirin. Birê din (navkirî û namzet) jî bi alîkariya peyvên 'nam' û 'nav' ku her du jî di eynî wateyê ne, hatiye pê. Dahûrîna birê yekemîn: 'Ber+endam', 'ber+bijar'. Peyva duyemîn jî layê xebatkarên Dengê Amerîyayê ve tê xebitandin. Her du peyvên din navkirî û namzet bi 'aday'a tirkî re xwediyê mantiqekî ne. Namzet bi farisî ye û navkirî jî bi kurmançî ye û ne dûrî 'nominee'ya îngilîzî ye ku bi koka xwe jî latînî tê.

Hevalên di Dengê Amerîkayê Beşa Kurdî de peyva berendam di cih de nabînin, lewre dibêjin pêwîst e kesê ku tê hîlbijartin bibe endamê saziyekê, lê mesela serok nabe endamê saziyê, lewre jî ne rast e ku mirov bibêje berendamê serokatîyê. Ev gotin jî min jî re rast tê, lewre endamtiya serok bêwate ye. Lê dîsa jî misoger nîn e ku kurdên Rojhilata Navîn û Ewrûpayê wê ve gotina me bibihîzin û ji bo piştevaniyê dev ji peyva berendam berdin.

Di soranî de peyvên 'navlêndraw' (kesê ku hatiye binavkirin) û 'palêwraw' yanê kesên ku hatiye bijartin, hene. Peyva 'palêraw' wergera rasterast a têgîna erebî 'mûraşşah'ê ye ku wan jî ji 'candidatus'a latînî sûd wergirtiye. Wate kesê ku bijarebûna xwe bi rûspanî daye selmandin. Hin caran peyva 'kandîdat' jî tê bihîstin ji devê soranan.

N Navên cografîk, nemaze navê cihên dûrî Rojhilata Navîn, li her parçeyê Kurdistanê li gorî sîstema perwerdehiyê û çanda dewleta serdest diguhere. Lewre jî sê awayên binavkirina 'Austria' hene; Nems, Ostrîş û Awistîrye. Nems bi erebî, Ostrîş bi frensî ye û ji aliyê farisan ve tê bikaranîn. Her wiha peyva Awistîrye jî tirkî hatiye wergertin ku awayê resen Avusturya ye.

Ez dibêjim hem gengaz e û hem jî pêwîst e ku di soranî û kurmançî de he-man peyvê were bikaranîn. Qet nebe em dikarin du peyvên nêzî bi kar bînin. Ji ber vê yekê ez dibêjim 'navkirî'ya kurmançî û 'nawlêndraw'a soranî du peyvên nêzîkî hev in û lewre jî divê ew bînin bikaranîn.

Têgînine din ên îngilîzî hene ku teqez divê mirov di kurdî de navekî li wan bike. Ji bo van hê tu peyv nehatine çêkirin. Yek ji wan têgînan 'Ame-

Her sê nav jî li ser dîtineke kevnare ava bûne ku çermê sor e. Ev têgîn bi xeter e, lewre dibe yek ji ber vê gotinê wekî 'nîjadperest' were binavkirin. Her wiha gelek kurd têkoşîna amerîkîyên xwecihî nêzî xwe dibînin. Lewre jî çênabe ku em vê têgîna kev-

Armanç

rican Indian' an jî 'Native American' a îngilîzî ye. Di tirkî de niştêcîhên (xwecihên) amerîkayê wekî 'Kızılderileler (çermesor)' tê zanîn. Di farisî de jê re 'sorxpuşt' û ereb jî 'al-hunûd al-humr (hindiyên sor)' dibêjin.

re ya rojavayî vejînin û bixin nava zimanê rojnamegeriya nûjen a kurdî. Divê mirov li ser mijarên wiha hesas baldar be. Li gorî zanîna min peyveke din nehatiye pêşkêşkirin, tevî ku di Beşa Kurdî ya Dengê Amerîkayê de van demên dawîn li ser peyva 'amerîkîyên resen' lihevkirinek çêbûye jî.

Mîna keke din peyva 'gypsy' a îngilîzî ye. Niha ev peyv bi xwe tê nîqaşkirin û bizavek heye ji bo ku ev peyv bi pey-

va 'rom'ê bê guhartin. Ew gel bi xwe wî navî li xwe dike. Di kurdî gelek peyv hene ji bo 'gypsy'ên kurdistanî, lê ew peyv ne nêtar in, ji aliyê wateyê ve neyînî ne. Ji peyvên ku kurd bi kar tînin her yek beşekî wan destnîşan dike. Navek bi tenê 'gypsy'ên ku bi muzîkê re dadikevin, navek jî ên pişekar û hwd. Yek ji wan jî li seranserî Kurdistanê nayê zanîn, ew jî mijareke din ku emê paşê lê vegezin. Ji bo çareserîkirina pirsgerê, ez dibêjim peyva 'dom' a ku ji peyva 'rom'ê derketiye, bi kêrhatî ye.

Arîşeyeke din jî hebûna peyvên cuda ye ji bo tiştêkî. Bo mînak beramberî 'to teach' a îngilîzî kurdên Tirkiyeyê dibêjin 'hînkirin' û kurdên Iraqê dibêjin 'fêrkirin', peyva duyemîn hem bi kurmançî û hem jî bi soranî ye. Peyvek ku ji aliyê her du alîyan ve jî tê fêmkirin 'elimandin' e. Lê ji ber ku koka wê erebî ye, gelek kurd naxwazin bi kar bînin. Di radyoyê de di cihê 'to train' (perwerdekirin) de em her du peyvyan bi hev re bi kar tînin, wekî 'hînkirin û fêrkirin'.

Berê di zimanê îngilîzî de jî tiştên wisa ne hindik bûn. Wekî 'last will and testament', li vir mebest ev e: Kesê ku ji 'will' a anglo-saxson fêm nekin, wê 'testament' a fransî fêm bikin û berevajî wê jî rast e. Gelek tiştên din jî hene ku ji yekî zêdetir navên wan hene di kurdî de. Ji bo çareserîya vê arîşeyê, em ji guhdarên radyoyê dixwazin ku ji me re binivîsin ka kîjanî tercîh dikin.

Wêje li Serhedê

XURŞÎD MÎRZENGÎ



Mirov nikane pê re bigihîne û wêjeya kurdî ya devkî bîne ziman. Wêjeya kurdî ya devkî ew qas dewlemend e, kûr û xwediyê pêgirteke dirêj e ku bi pênuşê nayê ziman. Tu dinêrî dengbêjek ne xwendina wî heye û ne jî nivîsandina wî heye, lê wêjeyê dewlemend wî di kilam û stranên xwe de pêk aniye. Seydayên me yên ku bi salan li unîversîteyan an akademyên wêje û hunerê perwerde bûne jî nikanin wan bêjeyan bînin ber hev, bikin hevok û bibêjin.

Ev huner ji dewlemendî û berfirehiya ziman û çand û toreyê dûr û dirêj tê. Li Serhedê her kes dengbêj e. Mêr jî dengbêj in, jin jî dengbêj in.

Îcar dengbêj bi xwe wêjevan û hunermend e. Ew mirovê ku huner û wêje pê re tune be nikane bibe dengbêj. Gelo çima li Serhedê her kes dengbêj e? Lewre Serhed hemû bi çiya ye û xelkê Serhedê jî bi pez û dewaran mijûl dibe. Zarokên serhedîyan xwe dibînin û nabînin di gundên wan de, di taxa wan de û di

nava mala wan de dengbêj distrin û stranan dibêjin. Hem jî ne ku yek tenê li mala xwe rûdine û stranan dibêje. Li civat û carîyan xelk kom dibe ser hev, civat çêdibe û dengbêj destên xwe dikin kerika guhên xwe û "De lê lê lê lê" dibêjin, civatê ker û lal dikin. Welew hezar mirov jî rûniştî be kes dengê xwe nake, kes napeyive û hemû civat bi mezin û biçûkan guhdariya wî dengbêjî dikin. Yanê zarokên serhedîyan bi hezaran car guhdariya dengbêjan dikin.

Zarok bi xwe di çalakîyên jîyanê de dibînin ku xelk jî rûmet û paye dide dengbêjên xwe û cihê wan di nav civatê de li jor e. Ew daxwaza li jor rûniştinê bi wan re jî çêdibe.

Îcar gava zarokê êvarê guhdariya dengbêjekî dike û serê sibê radibe bi tenê diçe şivaniyê, diçe ber pez, ew lawik li çolê tenê ye û ew xwe bi xwe jî xwe re ewil hêdî hêdî dilorîne. Dû re dengê xwe bilind dike û strana ku êvarê li gund jî dengbêj bihîstîye dibêje. Strana ku pê xweş hatiye jê re şîrîn bûye û di hişê xwe de girtiye wê stranê deh caran, bîst caran ji xwe re bi dengê nizm û bilind tîrêz dike.

Îcar ev Serhed e, çiya berz û bilind in, gelî kûr û asê ne. Gava lawikê serhedî pez dide bestê, xwe dide serê zinarekî bilind, di hêlekê de temaşa çêrandina pezê xwe dike û di hêla din de distire. Lê

gava distire û kilaman dibêje, dengê wî di fêrş û zinarên çiyayê hember de werdibe, lê dikeve û dizime û dizime. Îcar ew zimandin bi hindikî şeş heft caran tîrêz dibe. Yanê wekî ku bi zimanê ewrûpî dibêjin "eko" dibe. Ew dengê wî lawikî eko dibe û lawik bi xwe dengê xwe kontrol û kifş dike. Di vegera zimandina dengê xwe de, ew şaşiyên xwe dibîne û careke din wê şaşiyê nake û ew xwe bi xwe şaşiyên xwe rast dike.

Yekî ku jê fedî û şerm bike jî li wan deran nîn e. Kane kilamekê pêncî carî, şeş carî tîrêz bike û xwe bi xwe, xwe bigihîne wî dengbêjê ku êvarê li civatê stran digotin. Bêyî ku haya wî xortî yan jî keça serhedî jê çêbe di panzdeh, şazdeh saliya xwe de dibe dengbêj û wêjevan.

Hem jî ne wêjeya unîversîteyan û akademyan, wêjeya xelkê û nîrxên xelkê. Di wî wêjeyî de ne kîn û kudra çînî û ne jî berberî û dubendiya îdeolojîyan heye. Nemaze dîrok, rastiya dîrokê, evîni û rastiya nava evîndaran û qencî û başî heye.

Heke wêjenivîsên kurdistanî guhê xwe bidin kilam û stranên kurdî yên klasîk wê bibîbin ku çi hêjahî di wê wêjeya devkî û klasîk de heye.

Wê gavê wê hê şîrînî û tehdariya wêjeya zimanê me û dewlemendiya wî bê sehkirin.

Bîranînek

Zivistan bû. Berf û ba û bager bû. Serma û seqem hatibû welêt. Mij û moranê êdî xwe bi newalan de ber dida û din-ya tarî dikir. Di wan rojên cemidî û sermayî de refên gerilayan li serê zagrosan û çiyayên bilind hev digirtin û sirûdên berxwedanê digotin. Ew bi rê diki-tin wekî ku rojê nû di ser çiya re wê hîlbê û wê demeke nû dest pê bike.

Rojek ji wan rojên giran bi ser şer- vanên şoreşê de hatibû. Ji başûr bi rê ketibûn û ber bi bakurê Kurdistanê ve dihatin. Lê çiqas serma û seqem hebû- ya jî, ji ber ku ketibûn nav axa xwe êdî ji wan re ne xem bû. Êdî gehîştibûn evîna xwe ya bi salan. Jiyana bav û ka- lîn xwe êdî bi çavên xwe dîtibûn. Êdî ne birçibûnê, ne jî westandinê nikaribû wan bide rawestandî, bawerî û merxa- sîya wan gelekî moral dida wan, ew ba- weriya wan a xurt û girêdana wan a bi axa welêt û şoreşê ve, ji ber ku Kurdis- tan ji aliyê koledaran ve hatibû dagirki- rin ew bêhtir bi hêrs û kîn dikirin, li hemberî xayîn û xwînmijan.

Komekê ji wan qahremanên azadiyê jî, berê xwe dabûn sînore xeta Sûrî û derbasî bakurê welêt bûbûn. Êdî hati- bûn nav warê bav û kalên xwe, li der- dorên xwe dinêrîn ku berfa spî deşt û gelî hemû bi rengê xwe yê vekirî xem- landine. Ew gruba wan hevalên leheng, ji çar mîrxasên kurdan û xortên sim- bêlqeytan û çavreş û çar komûtanên pê- şeroja gel hatibû amedekirin. Ev grub, ji Bozan, Dawûd, Delîl û Avreş pêk di- hat û li ser milê her yekî ji wan jî Kale- şnîkoveke rûsî hebû. Bi rojê jî, di nav berfa spî de perwerdeya xwe ya siyasî û leşkerî dikirin û bi şevê jî dimeşyan.

Ew şevên zivistana malikxerab çiqas sar bûn, lê wan bi hilma xwe ew germ dikirin û ji hev re digotin: "Heta em xwe bigihînin gundekî nêzik, pêwîst e ku em gelekî hişyar bin. Ji ber ku dij- minê me gelekî hov û barbar e, divê em jî xwe bigihînin qonaxa xwe. Ango, em xwe nêzikî Cizîra Botan û çiyayê Cûdî bikin." Êdî belekiyên berfê ketibûn quntarê çiyân, serê girikan û beroşkên germ, ji ber ku tîrêjên rojê germiya xwe didan wan kaş û kendalên bilind, serê girikan û beroşk germ bûbûn. Êdî spîti- yê cihê xwe ji reşahiye re dihişt û hêdî hêdî aveke gerav ji wan axkonkê binya Çiyayê Cûdî dikire xuşexuş û xwe ber- dida ser Ava Mezin.

Hevalê Bozan û Dawûd bi hev re di- axivîn û wiha ji hev re digotin: "Çiqas mezin e ew qasî jî bi pêl û dirêj e. Lê ev ava berfê her çende ne pir e jî, dîsa jî Ava Mezin gerav dike. Miletê kurd jî di dinyayê de ew qasî mezin e. Belê çend xayîn û xwefiroş dixwazin vî gelê paqij bi qirêja xwe bilewitfinin."

Bi gotina hevalê Dawûd re hevalê Delîl bang kir: "Heval, heval Mizgîni-

yek min ji we re heye." Hevalê Bozan dibêje: "Xêr e hevalê Delîl, ka bibêje mizgîniya te çi ye?"

Hevalê Delîl dibêje: "Saetek û niv riya me maye ku em bigihîn warê Mem û Zînê." Hevalê Avreş: "Jixwe em ji mîj ve li warê xwe ne, ez bi kirina te keniyam."

Bi gotina Mem û Zînê hemû heval kêfxweş bûbûn. Piştî demekê gihîştî- bûn gundê Serdahlê û derbasî gundê Bafê bûbûn. Bi serê sibehê re ji Bafê bi rê ketibûn û gihîştibûn Newala Qoriyê û di ber Ava Mezin re dimeşyan, heta bi Germavê hatibûn û berê xwe dabûn Çiyayê Sîtê ku çiyayê gundê hevalê

mandin û şer pir giran bûbû. Şeş leşke- rên romê hatibûn kuştin û wan bazên hêja çekên her şeş leşkeran û kunyeyên wan jî ji ser laşên wan rakiribûn û bi xwe re biribûn. Lê hevalê Bozan diqîri- ya û bang dikire gundiyan: "Em şer- vanê azadiya gelê xwe ne" digot.

Piştî qîrîna Bozan careke din Newa- la Aşa bédeng bûbû. Êdî şev bi ser gund, çiyân û wan kevokên aştiyê de hatibû. Stêrkan li ezmanan xwe dabûn xuyakirin.

Gundî ji aliyekî ve ditirsiyan û ji ali- yê din ve jî ji kîf û şahiyê nizanibûn wê çi bikirana. Ji ber ku di wê cenga giran de gerîla bi ser ketibûn, lê hatina wê

de birîndar bûye, rast e gelo?"

Hevalan got: "Belê, rast e. Di wî şer- rî de hebû, lê birîndar nebûye. Meraqan nekin. Em hemû ji bo serxwebûna we latê xwe û azadiya gelê xwe şer dikin. Wekî şerê newalê emê her tim bi ser bi- kevin". Ferman dabûn ku gundî hemû li malekê kom bibin û ji wan re bi axa- vin. Dema ku Apê Bozan derdiket der- ve, Bozan di nobetê de bû. Jê pirs kir û got: "Heval, malbata Askero û zarokên wî çawan e?" Apê wî wiha bersiv da: "Baş in, lê ji roja şerê nizêr ve dijmin pir tade dida me tevan. Ji ber vê yekê malbata wî mala xwe birin Stenbolê."

"Qet nayêne gund?"
"Havînan tenê tene ser fêkiyên xwe."

"Baş e, spas. Em hêvîdar in ku emê hev bibînin. Eger em nemirin emê hev bibînin."

Bi dûv re gundî li hev kom bûn û se- rekê grubê dest bi axaftinê kir. Ji gun- diyan re qala bûyer û nûçeyên li Kur- dîstanê û rewşa gel kir. Paşê jî gerîla- yan xatirê xwe ji wan xwest û bi rê ke- tin. Riya wan dûr bû. Berê xwe dabûn xopana Mêrdînê û gundê ku jê re digot- in 'Xirbehêkêvir.'

Di wî gundê xopan de mala pîrejine- kê hebû. Kesî wê tune bû. Zarokên we- latê agir û rojê wê şevê li pîrê bûbûn mêvan. Şevê ji wan şevê zivistana sar bû. Sir û seqema ba kelemên daran hişk dikirin. Bi kêfxweşî li wê malê bûbûn mêvan. Ew şeva reş û tarî bi nivî bûbû. Berf û baran bi hev re dibarîn. Kesî ew hêvî ji pîrê nedikir, lê wê xeber gihan- dibû muxtarê gundê xwe û hevalben- dên dijmin. Pîrê ji muxtar re wiha goti- bû:

"Muxtar, çar zilamên bi çek îşev li mala min mêvan in."

"Tiştêk nabe pîrê, ew apocî ne. Mi- rovine pir baş in, zerar ji wan nayê, ba- weriya te hebe, heta sibehê wê bi riya xwe de biçin", muuxtar jê re gotibû.

Pîra mehû ji wan bazên çiyân re ne- gotibû min xeber daye muxtar. Muxtar û parîxwerê neyar telefon dabû Alaya Mêrdînê û ew refên kevokên aştiyê û hêviya gel ji bo çar quruş pere îxbar ki- ribûn. Bi serê sibê re ji Alaya Mêrdînê bi sedan leşker bi tank û topan dora Xirbêkêvir girtibûn û bi cemsî dihatin serê. Bi derketina tavê re şerê gerilayan û leşkerê dijminê xwînxwar dest pê ki- ribû. Gundê Xirbêkêvir bûbû meydana cengê û gola xwîne ji neyar re; bûbû goristan. Dijmin, bi dehan kuştî dabûn. Ji ber ku nikaribû li hemberî şerê qeh- remanan serê xwe rake, dijminê hov pir hêrs bûbû. Lê dîsa wekî her car ew rû- yê xwe yî gemar ji wan kesên pêşverû re dabû nîşan. Dîsa bombeyên kîmyewî û jehrî avêtibûn nav wan gulên rengîn û ew qurmiçandibûn.

CAN DILBİRİN



Bozan bi xwe bû.

Êdî ew bazên çiya û qehremanên şo- reşê, ew westandina xwe hemû ji bir ki- ribûn. Bi kêfxweşî hatibûn neqeba li ra- serî gund. Haya wan ji tiştêkî nebû. Dijmin di riya wan de kemîn danîbû, lê di kêleka gundê Avadorê de li nav rezê Nizarê Sedê, li derê neqebê qurmîna sî- lehan dihat, zarokên gundiyan digotin: "Ev dengê çekên hevalan e."

Qêrîn û nalîn bi Hevala Aşan diket. Ji dengê çekan êdî gundiyan jî baş za- nîbû ku heval ketine kemîna dijmin, lê pîrekên gundiyan bi tilîliyên xwe moral didane hevalan. Gelek ziyar gihîştibû leşkerên dijmin û bi şûn de direviyan. Lê qehremanên azadiyê şerê xwe dido-

gruba qehremanên serxwebûnê êdî bû- bû wekî xewnekê ji gundiyan re. Gelo rast bû an na? Ji ber ku nizanibûn wê çi bê serê wan, tîrsa wan ev bû. Ji ber ku zarokên wan di şer de bi ser ketibûn pir kêfxweş bûbûn. Bi hatina zarokên hê- viyê pêşveçûnek ketibû nav gundiyan û pismamê Bozan. Ew bavê du berxan bû, navê yekî Yawiz û yê din jî Bozan bû. Navê bavê wî lê kiribûn. Yekî şeş mehî bû û yê din jî yek salî bû.

Piştî şerê Newala Aşa, ew piling li gundiyan bûbûn mêvan û çûbûn mala Apê Bozan. Lê Apê Bozan biraziyê xwe nas nekiribû. Ji hevalên wî pirsî û got: "Biraziyê min jî li van deran e. Min wisa bihîst ku di şerê Newala Aşa



● 5-15. 03.1994: Kanferansa Naneteweyî ya Bakurê Rojavayê Kurdistanê li paytexta Belçikayê, li Brükselê hate lidarxistin. Di vê konferansê de, ku ji aliyê Projeya Mafên Mirovan a Kurdistanê (KHRP) û Medico Internationalê ve hatibû sazîkirin, ev biryar hate standin: "Ji bo çareserî ya pirsgerêka kurdî ya siyasî, divê bi sazgehên neteweyî re têkilî bêne danîn û xebatên pişkdar (muştêrek) bêne kirin." Ji welatên cur bi cur 150 kes beşdarî vê konferansê bûn. Her wiha vê biryarê, rîya xebatên diplomatîk ji PKK'ê re vekir û jê re bû gaweke nû û girîng

● 11.03.1970: Otonomiya Başûrê Kurdistanê hate îflankirin. Li gorî vê peymanê, hin selahiyet ketin destê kurdan. Bi Peymana Cezaîrê re (06. 03 1975'an), ya ku di navbera Şahê Îranê û Saddam de pêk hat, dawî

li Otonomiyê hat.

● 12.03.1994: Nûçevanê Özgür Gündemê yê Ruhayê Nazım Baba-oğlu, ji layê hêzên tarî ve li Siwêreka Ruhayê hate revandin. Heta niha jî wî tu saloxî nehatiye standin.

● 12.03.1995: Li taxa Gaziyê ya Stenbolê li dijî êrişên hêzên tarî gel raperînek pêk anî. Hêzên dewletê êrişî ser girseya gel kir û di vê bûyerê de 17 kes hatin kuştin.

● 13.03.1982: Ji Partiya Komünist a Kedê ya Tirkiyeyê (TKEP) sê şoreşger bi navên İbrahim Etem Coşkun, Necatî Vardar û Seyid Kanık bi destê cuntaya Tirkiyeyê hatin bidarvekirin.

● 14.03.1883: Karl Marks çû ser dilovaniya xwe.

AWIR

Michael Collins bû mêvanê Tirkiyeyê



Filmê Michael Collins jîyan û psîkolojiya rêveberên rêxistinên têkoşer jî bi hûrbîni tîne ber çavan. Dide zanîn ku têkiliya qehraman û dîrokê, têkiliyeke xurt e.

Di roja 28ê meha reşemiyê de filmê derhêner Neil Jordan, 'Michael Collins' bi navê "Özgürlüğün Bedeli" (Berdêla Azadiyê) li Stenbolê kete vîzyonê.

Mijara film li ser keşeya Îrlandayê ye. Film, di nav vê pirsgerêkê de jiyana rêveber û rayedarên rêxistinên Îrlandî yên têkoşer tîne ber çavan. Neil Jordan "Çend şerên ji bo serxwebûnê bêxwîn pêk hatine?", dibêje û berhemê bi mixtarê xwîna ku tê rijandin sînor nake. Gava ku bi baldarî bê nihêrtin tê ditin ku mafê kesane di ser her tiştî re tê girtin. Lê, ev kesayetî xwe her tim jî bo têkoşinê amade dibîne.

Wekî din çî di film de hene? Di destpêkê de Eamon de Valera (Leqem. Dev), (Alan Rickman), Michael Collins 'Mic' (Liam Neeson), Harry Boland 'Boland' (Aidan Quinn) û rêhevalên wan dilên îngilîzan in. Û bi neqadina ajanan tîne înfazîkirin. 'Dev' jî înfazê difilite. 'Mic' jî jixwe berê tê berdan. Gava ku derdikevin, dest bi xebata mîting û meşan dike. Di nav van çalakiyan de Kitty Kierman (Julia Roberts) nas dikin. Evina Kitty paşê dibe jêdêrka neyariya 'Boland.' Şerê çekdarî gelek dijwar e.

'Dev' jî jî girtîgehê tê revandin. Ew wekî serkomarê Îrlandayê tê pejirandin. 'De Valera' dixwaze ku Serokê Amerîkayê re rûne û alîkariya wî bixwaze. Lê

ev daxwaz li Amerîkayê pêk nayê. Têkçûna vê seyahatê pozîsyona 'Mic' bilind kiriye. Dev û yekê naxwaze. Ku Collins bi devleta îngilîz re peyman aştî îmza dike, Dev napejirîne û li dijî parlamena Îrlandayê çalakiyên çekdarî pêk tîne. Edî, rêheval bûne wekî neyar. Lê Collins dîsa aştîxwaz e. Hêvî dike ku ew, Dev û Boland disa wekî berê bi hev re bin. Collins tê kuştin. Ev jî bo civînekê li ser aştîyê çûbû wir. Her çiqas kuştina wî bi destê kê pêk hatiye neyê zanîn jî, Dev (Eamon de Valera) wê demê li wê herêmê bûye.


Bi kurtasî di film de mîrxasî, evîn, zikreşî, xayîntî, fedakarî jî baş xuya dibê. Ev tiştên han jî di nav jîyanê de her tim bi awayekî cih digirin. Jordan ev baş daye xuyakirin. Taybetiyeke film jî analîzên li ser jîyan û psîkolojiya rêveber û rayedarên rêxistinên têkoşer e. Film bi hûrbîni rewşê li ser çavan radixe. Di film de tê bi bîr xistin ku tesîra kesan jî li ser dirokê heye. Her wiha jî ber ev jî însan in kêmasî û xeletiyên wan jî wê çêdibin.

Filmîdi Festîvala Venedîkê ya 53'yan de hem xelata "Filmê herî baş" û "Lîstîkvanê herî baş yê zîlam" qezenc kiriye. Wekî din jî di "Beşa Dîtarî" û "Beşa Muzîka Dramatîk" de berendamê Oscar sala 1996'an e.

DÜZGÜN DENİZ

ÇAVDÊRÎ

LERZAN JANDÎL



Nivîsêde bêsernivîs

Ez prensîp de kesane ser ro, yan jî der heqê kesane de nivîs nênivîsnena û girêdayê naye jî nivîsanê aktîf-polîtîk nênivîsnê. Bêguman sebevê naye estê. Neke kêfê min nêwazeno, yan jî ez nêşikîna. Angorê bawerîya min, mordem ganî beşê xo de vîndero, der heqê kar û meydanê karê xo de binivîsno. Ebi na qeyde mordem şîkîno tayîna produktîf bo, tayîna hîra û zana binivîsno.

La belê nê rojanê pênyîye Tirkiye de rojev hênî rew vurîno, çiyê hênî înterîsantî vacînê û ênê kerdene, ke mordem mecbûr maneno, meydanê xo ra biveciyo û na der heq de jî binivîsno.

Tirkiye de mordemanê û însiyatîfanê sivilan yew kampanya kerde ra. "Seba roştî yew deqa tarî" Na kampanya bêguman heto jû ra seba aktîf kerdene fikiriyene yê şarî rind a. Heto bîn ra kampanya bi xo, bê zor a, ebi aştîya.

Seba na kampanya gelê kesane fikir û bawerîya xo vate. Nînan ra fikrî zaf înterîsant bî. Zê "Ne kesî xayîne welatî yê." "Nê dansê gulu gulu kenê." Yan jî, "Nê kayê mume şaynayene kay kenê."

Nê vatenan ra tewr absurde varena Ş. Kazanî biye. Ez bawar nêkena, ke Ş. Kazanî na varenena xo ebi nezanayene vate. Tersê naye, ebi zanayene vat. Ebi naye jî waşt, ke probleman veco yê ke estê jî girs kero.

Ma qey çinay re? Sebebê naye zaf zelal o. Eke yew kes, partiye, organîzasyon îktîdarî ser ro kay keno, yane wazeno, ke îktîdar bigêro xo dest, yan jî bêro îktîdar, ganî qiweta xo nişan bidêro. Dorajêna nişandayene yan jî şîklê vatene gor partiyan û partiyan de jî kesane vurîno. Sebete ke nê mordemî wertê şaran, dînan û şenikiyan de probleman vetene yan jî probleman çareser nêkerdene, la belê tûj kerdene ra medet wazenê, û na raye jî rayêde tevr rehet a. Teyna na raye xebetnanê. Na raye rayêde zaf teleko ya. Naye ra her kes hema her kes zerar vînenno.

Zerê nê halê nazîkî de tene kesî ke xo ra vanê "roşnabîr" yan jî "demokrat", wertê mîlîtarîzm û şerîatî de tercîh kenê. Tayê roşnabîr û demortatê hemdemê nayere jî "laîsîzmî", ke Tirkiye qe rojê ne biya laîk, ne jî biya sekuler, wazene. Sebete ke pawenciye laîsîzmî jî leşkeriya tirkane a, ganî leskerî mudahele bikerê. Nê demokratî leşkeran silaynenê.

Heto bîn ra utra "roşnabîr" û "demokratî" estê, sebtanê demokratî û roşnabîriya xo ra raya şerîatî, yanê na dinya de dewlete, kesane şaran ebi namê heqî îdare kerdene, kenê ra. Nê wazene ke her kes nînan şîrîn bivîno. Qe zêre kesî nînan ra memano. La belê xo vîra kenê, ke şîklê û metodê Ş. Kazan (M. Menteşê) jî metodê desînfarmasyon, zure û şaşî yê. Eke nê "roşnabîr", "demokratî" Gøbels nêwendo wa biwanê, ke bişîkiyê na polîtîka nas bikerê.

Rastîyê çik a. Rastîyê ne gîzmeyê leşkeran e, ne îdeolojiyo resmî yo û ne jî rejîmêde totalîtr o. Raştîyê yan jî çareserkerdena na mesela, azadiya şaran, zîwanan, dînan û kesane a. Eke şarî, kesî, dînî, zîwanî azad bê mesela jî hal bena. Eke Tirkiye de kurdî, lazî, çerkezî û êb. êzdî, asûrî, alevî azad bê, kesî qul mebe zê yew şexsiyetî, hemwelatîyî azad bê, nê problemî jî ênê çareserkerdene.

Wertê di çîyanê xiriban de tercîh kerdene ganî karê roşnabîran û demokratîyan mebo.

Hunermend Mehmûd Ezîz:

Huner rûmeta mirov e

Gelek hunermendên kurd ên emekdar hene ku ji bilî hawirekê zêde kes ji wan ne haydar e. Rewşa parçebûyî ya welat û gelê me sedemeke mezin e ji bo vê yekê. Hevalê me HELÎM YÛSIV, bi pêkanîna hevpeyvîna bi Mehmûd Ezîz re, hunermendekî dîtir ji Başûrê Biçûk bi me dide naskirin; çawa ku berê jî bi hin hunermendan re çavpêketin anîbûn pê.



Mehmûd Ezîz, yek ji van dengbêjên bi nav û deng e di nav xelkên me de, ku jiyana xwe bi stran, saz û awazên kurdî ve girê daye û hetanî vê gavê kaniya vî dengê zelal nehatiye miçiqandin. Mehmûd Ezîz ligel sazband Mihemed Elî Şakir (birayê wî) strana kurdî zengîn kiriye û gelek stranên wan yên tenik û hêjayî di dilê gel de û di folklorê kurdî de cih girtine.

Hunermend Mehmûd Ezîz, di sala 1950'yî de li Başûrê Biçûk, li Derbêsiyê ji dayik bûye û niha li Serêkaniyê jiyana xwe didomîne.

M. Ezîz mirovekî hesttenik e, ne xwe tenê dibîne û ne jî tu tiştî di ser pêşxistina hunera kurdî û gelê kurd re dibîne. Ev rastî, vî hunermendê hêja bêhtir nêzikî dilê mirov dike û pêwendiyên di navbera huner û jiyana wî de xurtir dike.

Dengê Mehmûd Ezîz zarokî û hêviyên kevn û tenikbûna evîn û jiyana kurdan tûne bira mirov, ji deh salan ve ev dengê zelal bilind e, gelo kaniya dengê we ji ku diherike?

■ Dengê min wîrasî ye, kalikê min li Mizgefta Derbêsiyê bang dida. Li Heylûn (gundekî ku du kîlometre dûrî Derbêsiyê ye) xelk li ser dengê wî ji xew radîbû. Bavê min jî dengê wî xweş bû, lê ew bû qurban ji me re. Çimkî kalikê min dîndar bû û tim tembûra bavê min dişkand. Lê bavê min rê dida me û ji sala 1963'an de me dest pê kir.

Ji ber ku kalikê min gelekî ew dabû ber azarê, wî nexwest zarokên wî wê êşê bikişînin. Û di demeke kin de di sala 1969'an de min çend stran li Istgeha

Di 1968'an de Y. Berazî sê stran dan min, ew jî ev bûn: 'Gulîzarê', 'Şîn bû rihan', 'Te dilê min bir lê Canê.'

Piştî wê, sê çar stranên din dan min.

Min gelek alîkarî bi Mihemed Şêxo re kir. Bi alîkariya min bû hunermend, ev rastiyek e. Ji ber ku heta 1970'yî Mihemed Şêxo nedistira, ji 1971'ê pê de bû endamek ji Koma Serkewtin. Min du stran dan wî. Ji vê yekê M. Şêxo di bin bandora rengê strana min de bû.

Kurdî (Radyoya Kurdî) li Bexdayê tomar kirin. Vê gavê bi alîkariya mamoste Yûsif Berazî (Bêbuhar) bû, yê ku destpêkê alî min kir.

Pişt re mamoste Mihemed Elî Şakir ev rê ji dest girt û wî dest bi danê kir.

Xuya ye rola sazband Mihemed Elî

Şakir birayê we di avakirin û belavkirina stranên we de gelekî girîng û balkêş e. Têkilî û pêwendiyên we çawa saz bûn, we dirokeke dirêj bi hev re qedandiye?

■ Biratiya me, hem biratî û hem hevaltî ye, em hev û din temam dikin, em her du canek in û em bêhev nabin. Piştî sala 1970'yî ku ez çûm Beyrûdê, ew leşker bû û stran ji min re bi rê dikirin. Di 1970'yî de li Beyrûdê min Koma Serkewtin ava kir, wê çaxê çend stranên xweş ji min re şandin û me di Salona Rîvolî de şevêk li dar xist û Saîb Selam, Serokê Karê Rûniştvan û Wezîran yê Lubnanê hazir bû, me ev stran pêşkêş kirin:

'Gulçînê', 'Zeynebê', 'Gewrê', 'Ey dilo', 'Perwîn', 'Dengê wî dilî', 'Xwedîya kezî.'

Pişt re bi pîrbûn da min, ji deh kasetan heşt ji wan saz û gotinên M. E. Şakir in. Ji bilî folklor û çend stranên Berazî, heta niha li dora sed stranî gihandîye min.

Bi bilûrê me dest pê kir, em li gundê Eba bûn, zivistanê em li dibistanê bûn û havînê em dihatin gund, me bexçe çêdikir. Em digel kar li ser mûzîkê jî dixebitîn.

Di 1983'an de mamosteyekî navê wî Henna bû, ûd ji xwe re anî, me bi 25 diravî kirî, lê me nizanibû ew dûzan bikira. Ne istgeh, ne televîzyon hebûn. Ji radyoya cîranan me dixwest em fêr bibin. Hetanî li Serêkaniyê yekî dûzan bi M. Elî Şakir da naskirin. Stranên giran, her carekê me lê guhdarî dikir, me dikarîbû bistira.

Di 1968'an de em hatin Serêkaniyê û di navbera Urdûn, Beyrûd û welat de em belav bûn, hetanî 1974'an ku Beyrûd xera bû. Têkiliyên Urdûnê û Sûriyê jî li hev ketin, em mecbûr bûn ku em bimînin. Hunermend di rewşeke bobelat de dijî, hunermendê gelêrî tenê dikare bijî, huner şeref û rûmeta mirov e.

Ji bilî stranên birayê we, çi stran we gotin. Tu navên veşartî hene di riya pêşxisin û bilindkirina deng û mûzîk û hunerê de ku we di wan salan de pêşkêş kir?

■ Rola Yûsif Berazî winda nabe, di danîna kevîrên bingehê de. Min jî çend stran ji xwe re saz kirin: 'Delala min', 'Dema min di por zerî', 'Yadê rebenê, (gotin ên Kemal Şanbaz in)', 'Keko Rabe.'

Gotinên van helbestvanên wekî Cegerxwîn, Omerê Lalê, Mehmûd Berazî, Hemîd Qado û hwd. bûn. Min ji van helbestvanan re stra û ji bilî Bêbuhar û M. E. Şakir min tu sazên kesî negirtine.

Karê 'Koma Serkewtin' û rola wê di wê demê de çawa bû, çima hetanî niha hûn di riya koman re (niha Koma Buhar) dixwazin bixebitin?

■ Ji 1970'yî hetanî 1974'an 'Koma Serkewtin' berdeham kir, me çar şev li dar xistin (li Rîvolî 18-11-1971). Heşt meh û deh rojan me xwe amade dikir, Kemal Şanbaz û xortên din ji Amûdê, Mihemed Elî Ressînî, Mehmûd Zêro û reqs û sema, navê wî Remedan bû, ya din li Sînemaya Cendûl û ya din jî li Sînemaya Bîmlosê (1972), ligel Mihemed Şêxo li ser bizqê. Wê çaxê Mihemed Şêxo nedistira.

Di wan çar salan de min û Seîd Yûsif (Koma Newroz) me li Beyrûdê û Urdûnê bi hev re kar kir. Li Urdûnê me şahiyek li dar xist, di 1976'an de; di Yûbîlê Zivî de yê Melek Husên, rê dan komeke kurdî û min û Wedî Esafî (dengbêjekî ereb î navdar e) me şahiyek bi hev re çêkir. Li Emanê jî di bin siya Selaheddîn (komeleyeke kurdî ye) de me şahiyek li dar xist.

Em bêhtir nêzîkî çepê kurd bûn, bi alîkariya wan ev kar dibû. Armanca me

ew bû ku, mûzîka kurdî cihekî xwe bigire di meydanê de, hetanî ku şer û xerakirina 1974'an li Beyrûdê bû, ev kar jî rawestiya. Tiştê jî me dihat xwestin, me kir. Gelê Lubnanê li ser kurdan digotin boyaxçî û hemal in, bi van çalakîyan hat naskirin ku kurd ne tenê boyaxçî ne, belê gelekî xwedî mûzîk û huner e, hinekî nêrînên gelêrî li Lubnanê hatin guhartin.

Têkiliyên we û istgeha kurdî li başûrê welêt çawa dest pê kirin, li ser çi bingehê?

■ Derketina me ya bi alî Beyrûdê ve

Di riya dawetan de huner xera dibe, kaset bêhtir hêza deng û hunerê ji guhdaran re diyar dike û dema ku propaganda tune be strana kurdî dimîne di hepsê de û dernakeve. Em hewceyî sazgehên mezin in, kaset jî belavkirina wê mîna meşa gêrgêrikê ye, bi perîşanî digihîje guhdaran.

jî, ji ber ku çarçoveya karê hunerî firehtir bû, ne qedexa bû. Çar salan ez li wir mam û ji 1969'an hetanî 1979'an heft heşt caran ez çûm Başûrê Mezin, min û Mihemed Teyib Tahir me şevên strana kurdî li dar xistin. Digel Tahsîn Taha û Fûad Ehmed û Gulbaharê re me gelek

Dîsa em vegerin ser karê komên mûzîkê, koma we Buhar dikare çi bike ji strana kurdî re?

■ Taybetiyeke koma me heye, hunermend di komê de hene, kom ji deh endaman pêk tê. Hunermend Mustefa Xalid gelekî nêzîkî min e û Seîd Kîkî hebû, wefat kir û Husên Şakir, Hemê Ebû Zêd, Silêman Mihemed Emîn û Hemîd Silêman tev de dangbêj in û sazvan in jî. Em kasetan tomar dikin, alîkariya hunermendan dikin, ên ku nikarin stûdyo kirê bikin. Me kasetek ji Kennan Şêxo re tomar kir û yek ji Şehrîbana Kurdî re.

Di 1985'an de 'Koma Buhar' hate damezirandin, di 1994'an de me dest bi tomar kirinê kir û li gorî xwe kom alîkariya dengbêjan dike.

Mihemed Şêxo, Seîd Yûsif, Mehmûd Ezîz, sê stûnên bingeha strana kurdî ne

Bi çend stranên min deng da, wekî: 'Hebs û zîndan', 'Yadê rebenê', 'Keçka kurdî', 'Gava li me hat eyd û erefat', 'Eman dilo', 'Peymama min şêrin yarê', 'Kedera min çendî ciwan e.' Ev alîkarî min pê re kir, pişt re stranên wî jî çêbûn û riya xwe berdeham kir.

Seîd Yûsif hunermendekî mezin e, sazband e, çiqas li Beyrûd, Urdûn û li Sûriyê jî me bi hev re şahî saz kirine, niha tu riyên berçav tune ne ku em ji hev re nêzîk bibin, belê dema rewş bi vî rengî be, her kes bi xwe di riya xwe de dimeşe.

Gelek caran hûn li dawetan tèn dîtin, we gelek şahiyên dawetan li dar xistine, di baweriya min de hinekî rengê stran û muzîka we dîrî rengê mûzîk û stranên dawetane. Çi sedem bi dû vî karê we de ye?

■ Mecbûrî zane, dema hunermend tiştêk di destê wî de tune be, wê çi bike, hunermend ne mar e bi axê bijî. Berê guhdar pirtir bûn. Niha bêhtir em di dema lez û bezê de ne, stranên wekî 'Gulîzar' û 'Li ser singê behrê' wê kî lê guhdarî bike? Ez berê nedîçûm dawetan, ji bilî yên dostan. Ez bi vî rewşê diêşim, dema wekî ku ez dixwazim bibêjim ez naêşim, lê mixabîn dengbêj



şahî saz kirin û di Newrozê de me bi hinek hunermendên ereb re şahî çêdikirin. Wekî Sadûn Cabir, Elyas Xidir.

Di 1969'an de li Başûrê cirîdeyêke stranên çêdibû û hunermendê ku bi ser biketa di vî cirîdeyê de dibû ji istgeha kurdî û kengê here sînga wan jê re vekiribû.

Encûmanek jî hebû (Îbrahîm Cum-bûş û Eli Merdan) stran dinirxandin. Ez bi ser ketim, her ez diçûm Bexdayê, li Beşê Kurdî, ligel koma wan a muzîkê min stran tomar kirin. Li dora bîst stranên min tomar kirin û li Kurdistanê me li Kerkûk, Dihok, Hewlêr, Zaxo û Selaheddîn, Sersingê min û M.Teyib Tahir me şahî saz dikirin.

li Başûrê Biçûk, çi we her sê hunermendan digihîne hev û çi we ji hev û din cuda dike?

■ Gelek alîkarî di navbera me de çêbû. Min gelek alîkarî bi Mihemed Şêxo re kir. Bi alîkariya min bû hunermend, ev rastiyeke e. Ji ber ku heta 1970'yî Mihemed Şêxo nedistira, ji 1971'ê pê de bû endamek ji Koma Serkewtin. Min du stran dan wî: "Di baxan de (gotin ên Cegerxwîn û sazê Bêbuhar e) û 'Carkê min ji xwe re di gewrek', (gotin û sazê M.Elî Şakir in). Ji vî yekê M. Şêxo di bin bandora rengê strana min de bû. Destpêkê fedî dikir, fedyok bû, gelekî giran didit ku rahêje mîkrofonê û derkeve li ber gel bistirê.

mecbûr e ku wekî xelkê bike. Ango mewal (serhewa, kilama dengbêjkî), koplâ (dûzan) mûzîkê divê tu rakî, tu nebêjî.

Hîn ez derneketime, bi destên hev digirin ji bo reqsê û govendê, stranên min jî ne yên govendan in, tu dikarî bibêjî sedem aborî ye.

Di riya dawetan de huner xera dibe, kaset bêhtir hêza deng û hunerê ji guhdaran re diyar dike û dema ku propaganda tune be strana kurdî dimîne di hepsê de û dernakeve. Em hewceyî sazgehên mezin in, kaset jî belavkirina wê mîna meşa gêrgêrikê (morî, gêre) ye, bi perîşanî digihîje guhdaran. Propaganda divê bi rola xwe rabe.

Arînek ji zozanan

Sehneya yekemîn

(Cih zozanekî Serhedê ye. Bayê kur konê Xêriyayê dihejîne. Xêriya ji hêlekê ve bi stûna kon digire û ji hêla din ve ji neviyê xwe Hêşar re dilorîne.)

Xêriya: (Bi gazin) Hêdî keçê, hêdî te çepilê mekîneyê şikênand. Dergûşa ku zêde negirî ma ji çi re dibe?!

Sidîqe: Pênc salî ye, dergûşa çi ye... Di serê we de mîrate bimîne.

Xêriya: Carê devê xwe ji xêrê re venake. Bûkê îşev sê piştî zil û daran bide paşiya pêşa kon. Bi şev hîç rana-be. Êla cîran do şewitandin.

Sidîqe: Keregêjeke wekî te bûye sedem. Yekî çerçî du derziyên piçûk bêpere danê. Gotiye ku "Ez ji Darahênê me. Du zaroyên min li çiyê ne." Sosê xapiyaye û tûrikê xwe vala kiriye.

Xêriya: Îşev li derve agir pênexe. Sibehê şîr biqusîne. Rûn biavêje çalavê. Bextê me yê reş, ew qas ked û êş, du kilo rûn bi du kilo bacanan e.

Sidîqe: (Axîneke kûr dikişîne û Hêşar dide ber sînga xwe.) Dayê tu raze.

Xêriya: (Bi dengê herî nerm û nîzim) Teeww xew! Kîjan şevê min bi dilekî rehet serî daniye ser balgiyê. Şixulê hirç û kûçikan ne kifş e... Pirê wan jî bi kurdî dizanin.

Sidîqe: Kumandar gotiye ku "Li varan yek teqîn çêbibe emê hemû êlan bişewitînin."

Koro:

Kê gotiye ku çiya bêzagon in
Kew bi per û baskan
çiyayê vedikolin
Av û agir, çiya û jiyayê
Mizgînan mizgînan!

Sehneya duyemîn

(Xêriya fanosê dixwe xiznê. Serê xwe bi temîziyeke rengîn dişidîne. Hêşar bi îskeşk digirî. Ji derveyî kon dengê keçikekê tê. Navê keçikê Medya ye)

Medya: Yadê! Xaltîka Xêriya...

Xêriya: (Bi dengê bilind) Ha keça min, tu hatiyî havên? Min ji bîr kir ku ez bînim.

Medya: Belê yadê, ez hatime havên.

(Xêriya dest diavêje piştîyê zilan ku hilde ser milê xwe, lê nikare. Sidîqe alî wê dike û metelmayî dipirse.)

Sidîqe: Tu ya li derve nas dikî?

Xêriya: Belê ez baş nas dikim. Ez navê wê nizanîm, min bejn û bala wê jî nedîtiye, lê ez wê nas dikim...

(Sidîqe pêşiya kon vedike dibîne ku keçikeke şanzdeh salî xwe wekî bêrvanekê girê daye, xemilandiye û satilêk bi milê wê ve daleqandî ye.)

Medya: (Bi ken) Ka vî şîrî bigire.

Sidîqe: (Şaş dimîne. Paşê satilê ji destê wê digire û bi dengê herî nîzim) Şîrî haaa!

Medya: Ne heram e. Ez çûm nav keriyê pez û min pênc mîhên we dotin.

Xêriya: De were keça min. Tu bi-xêr hatî û tu bi selamet hatî.

(Sidîqe û Medya hev û din maç dîkin û himbêz dîkin. Medya nivînen raxistî qat dike û rûdine. Ji paşila xwe demançeyekê û çar kivkarîkan (kuvar-kan) dertîne. Hêşar hêj digirî.)

Xêriya: (Kivkarîkekê hil dide û dirêjî Hêşar dike.) Ha ji te re, xaltiya te ji te re kivkarîk anîye.

Hêşar: Tu xwenga Sidîqe yî?

Medya: Belê.

Hêşar: Wê çaxê ji bo çî te ji min re erûg (hincas) neanîn?

Medya: (Disekine, çavên wê bi bacanên sor ên li ser mekîneya şîr dîkevin. Bi dizîka ji Sidîqeyê şekir dixwaze. Radibe bacaneke piçûk hildide, şekir lê direşîne û dirêjî Hêşar dike.) Tu ji erûgên sorik hez dikî ne wilo? Ha ji te re.

Hêşar: (Bi dilekî şad erûgê dixwe berîka xwe.) Xaltîkê, ez sibê hevalên xwe diqehêrinim.

Xêriya: Xwelî li serê we û adetên we be. Hûn hew dikarin hev û din biqehêrinin.

Koro bi dengê xemsar:

Welat diariya
Adet diariyan
Em diariyan
(Hêşar radize. Medya û Sidîqe kivkarîkan li ser kuçkên agir diqelînin.)

Xêriya: Medya, di hatinê de kesî tu dîtî?

Medya: Li mîrga çeqel tîm û leşker hebûn.

Xêriya: Tu dîtî?

Medya: Na. Sêrdo kî ye?

Xêriya: (Sidîqeyê rê dide.) Pîsmamê vêya ye...

Sidîqe: (Bi awirêkî tûj li Xêriyeyê mîze dike.) Ê min ji wî çî ye? Tu dixwazî bila birayê min be. Bêxîretekî beradayî ye.

Xêriya: Bi Xwedê her tişt serobino bûye. Em nema dizanin kî li ser çî guhî ye.

Medya: Ev heşt sal in ku şer didome, ne hêsan e. Îro gunehê min bi leşkeran hat. Xewa mirinê ketibû çavên wan. Belengazan nizanin ku ji bo çî şer dîkin. Vî şerê gemarî jiyayê wan herimandiye.

Koro, piştî keneke dirêj:

Ev ne ken e ne jî xem e
Dil giran bûye dil giran bûye

(Sidîqe sifreyê hildide. Xêriya nivînen qatkirî radixe. Ji sindoqê cotek go-reyên rîs dertîne, dide Medyayê.)

Xêriya: We ji tîrsa şewatê nivîn neanîn. Ev nivînen kevn û bêkêr in. Kon jî yê kevn e.

Medya: Ez û tu bi hev re razin.

Xêriya: Na na na! Ez kor û merezdarî û nexweş im jî. Tu ciwan î. Wê nexweşiya min bigihê te. Na dayika min na. Tu û Sidîqe bi hev re rakevin.

Medya: Tu diya min î.

(Xêriya bi dawa xwe hêstirên çavên xwe paqij dike. Medya ji piştê ve Xêriyeyê himbêz dike û radikevin.)

Sehneya sêyemîn

(Sidîqe elb û gomik û kovikê hildide û derdikeve. Medya û Hêşar bi keviran malokê dileyizin. Xêriya dirêse.)

Medya: Rêberên êla we kî lê ne?

Xêriya: Em giş jî rêber in. Cahil bi ya ahilan dikenin.

Medya: Hûn di nav xwe de sê kesan bibijêrin ma ne çêtir e? Binihêrin Sosê bi serê xwe tevgeriyaye û xisare-ke mezin daye êla xwe.

Xêriya: Ez ji ahilan re bibêjim, bê ka ew çî dibêjin...

(Ji nav êlê deng tê: Çerçî çerçîî! Tişt erzantîmî)

(Koro, hew 'çer' dibêje û bêdeng dimîne.)

Xêriya: Nalet li te bê, ger tu çerçî yî...

(Medya pêşiya kon hildide û li 'çerçî' dinihêre, paşê di bin çavan re keneke şerîrîn pêşkêşî Xêriyayê dike.)

Xêriya: Ji bo çend qurûş pereyan her tiştên xwe firotine.

(Sidîqe gumikê şîr û elbê datîne. Bi milê xwe xwedana xwe paqij dike. Ew û Medyayê şîr diparzinin. Ji der ve di-sa deng tê: "Çerçî hat çerçîî.")

Xêriya: Ha bi Xwedê ev çerçî ye. (Medya pêşiya kon hildide, dinihêre ku cixareya pêçayî li paş guhê çerçî ye. Yê çerçî dest diavêje cixareyê.)

Koro:

Çerçî hat çerçîî!
Bavê lawîk î tolhildanê me
Di warê wêrankirî de
Mizgînan dihonim
Ji dilên şikestî re
(Medya Hêşar maç dike û derdike-ve.)

Sidîqe: Dayê xwe baş girê bide. Hêşar jî binixumîne. Dibêjin ku mal-mîrateyê sîxur li van deran e û heval jî li wî digerin...

(Ji gelyê li jêrî êlê dengê teqînan tê.)

Koro:

Çerçî hat çerçîî...!
Çîrokan dibêjim
Dilan şad dikim
Mala min geh zozanên Serhedê ne
Geh zinarên Sîpanê ne
Xewnên xwe li Botan dibînim

Sehneya Çaremîn

(Wekî ku her kes li benda tiştêkî

bin. Tişt ne kifş e, lê tîrs di êlê de he-ye. Kesên êlê xwe amade dîkin. Xêriya û Sidîqe kûzên rûn ji kon dertînin û li derveyî kon vedîşêrin. Bi dengê fir-firokê re leşker dikevin nav konan û tevaya kesên êlê dicivînin.)

Kumandar: Tu kes hate vê êlê?

Xêriya: Belê, du çerçî hatin û çûn. (Di nav wan de leşkerek wergêrê dike.)

Kumandar: Divê ji niha û heta sê rojan hûn ji vir bar bikin.

Xêriya: Lolo komitan, kinkorik zer bûye. Ji xwe ev meh ji bo me bikar e.

Kumandar: Ji xwe tu mirî yî, ma xema te ye, kora gêj. Em her saniye di-mirin û radibin.

Xêriya: Ma hûn li vî welaatî li çî digerin? Herin mala xwe û nav zarokên xwe. Min deh zarok xwedî kirine. Dilê min li hemberî deh dilan e.

(Hêşar çengek kevirên saxsî diavê-je nav agir, kevir diteqin. Bi teqîna ke-viran re leşker xwe diavêjin quncikan. Kumandar ketûber derdora xwe gule-baran dike. Xêriya dikeve xwarê. Hêşar direve kon. Tevaya konan dişewi-tînin. Nav konan tarî ye.)

Hêşar (berê tîvinga ku ji zilan çêki-riye dide yê kumandar): Teq teq teq, min tu kuştî, êdî tu mirî yî.

Koro:

Bîngolê tu ava bî yar yeman
Tijî bûk û zava bî can gulam can
(Mij û dûman hêdî hêdî belav dibe û Xêriya radibe ser xwe. Kumandar çekê ji dest xwe diavêje û xwe dispêre kevirêkî.)

Kumandar: Min tu kuştî. Tu mirî yî...

Xêriya: Tu nikarî min bikujî, ez namirim, ez ev erd im, av im, ez bayê kur im, latên vî warî me, ma kê heta niha kariye min bikuje ku tu jî karibî min bikujî...

(Koro bi dengê çepikan re)
Kî mir, kî nemir
Hîç kes nemir heval
Paşilên dayikan germ in.
Welatekî kesk dibîşkive
Roj li Serhedê zer dikene

Hêşar: Xaltîka Medye, erûgên min bîne gund. Erûgan ji hevalên min re jî bîne. Êdî ez kesî naqehêrinim.

(Nûçeyên radyoya tirk: Li derdora Bîngolê di navbera hêzên dewleta me û terorîstan de şer derket. Di vî şerî de di serî rêbera terorîstan Xeyriye, gelek terorîst hatin kuştin. Lê mixabin leşkerêkî me jî şehîd ket.)

Koro:

Roja me naçe ava
Mala derewan nîn e
Welat kesk dibîşkive
Roj li Serhedê zer dikene



Li navendên çandê çalakiyên vê hefteyê
Li NÇM'ya Stenbolê

- 9.03.97 **Yekşem**: Panela bi navê "Ji nav qada ked û şer, portreyên jinan": Yeter Kaplan, Xanim Tosun, Elif Demirel, Hatice Çelik, Cemile Çakır, Sevil Erol, Hacer Aydın, saet:14.00
Sînevîzyon: 'Jin û Jiyan', saet: 16.00
Teatra Jiyana Nû: 'Ji Mirinê Veger Tune ye', saet: 16.30
Konsera Koma Gulên Xerzan, saet: 17.30
- 12.03.97 **Çarşem**: Belgefîlmê Gaziyê, Aydın Bulut, saet: 17.00
Semîner: Wênevan Muhammed Salayî 'Li ser Helepçe diaxive', saet:18.00
- 14.03.97 **În**: Fîlmê Danton, derhêner Andrej Wajda, saet: 18.00

● 15.03.97 **Şemî**: Bîranîna Mihemed Şêxo, saet: 14.30
Teatra Jiyana Nû, Bayê Elegezê, saet: 17.30

Li NÇM ya Îzmîrê

- 9.03.97 **Yekşem**: Konsera Koma Çiya, saet: 14.00 û 18.00
- 14.03.97 **În**: Şanoya Sehneya Gel a EKSM - Rojnivîska Îşkenceyê, saet: 17.30
- 15.03.97 **Şemî**: Şanoya Dengê Bahozê: 'Hêviya me hûn in', Koroya Zarokan, Konsera Dengbêj Seyda, saet: 18.30
Li BEKSAV'ê
- 12.03.97 **Çarşem**: Belgefîlmê Taxa Gaziyê, pêşandana wêneyan: 'Gaziya Azad', saet:18.00

RÛDAN

NÇM'ya Îzmîrê bû dusalî



Rayedarê NÇM'ya Îzmîrê Ahmet Kaya, li ser girîngiya saziyên neteweyî rawestiya û got: "Ger gelê kurd dixwaze xwe rizgar bike, divêt li çand, huner û zimanê xwe xwedî derkeve."

Bi sedsalan, nîştimana kurdan ji layê dagirkerên tirk, ereb û eceman ve hatiye parvekirin. Ligel vê jî ziman, çand û hunera kurdî jî parçe bûye. Xuya ye ku wê têkoşîna herî girîng û dijwar di vî warî de bê dayîn.

Têkoşîna rizgariya gelê kurd diwarên xwe bi xwe lêdike, saziyan ava dike. Yek ji van saziyan jî NÇM' ye. NÇM ji bilî navenda li Stenbolê û şaxên li Îzmîr, Ruha, Edene, Mêrsîn jî rehên xwe berdane nava gelê kurd. Her wiha şaxa Amedê ji layê polîsan ve hate girtin.

NÇM'ya Îzmîrê, salvegera du-yemîn a vebûna xwe bi çalakiyên cur bi cur, bi stranên rengîn û dilşad û bi piştgiriya gelê kurd, bi awayekî çêş pîroz kir. Dirûşme ev bû: "Nirxên çand û hunerî yên kurdî ku ji layê dagirkeran ve hatine talankirin wê yek bi yek ji destên wan bîn derxistin."

Li ser navê kargerîya NÇM'ya Îzmîrê Ahmet Kaya, ji bo salvegera vebûna NÇM'ê bi kurtayî axaft. Kaya li ser girîngiya saziyên neteweyî rawestiya û got: "Saziyên di warê çand û huner de, ji bo hebûna gelan pir girîng in. Ji ber vê yekê, dagirkeran ji bilî parvekirina nîştimana kurdan, ziman çand û hunera wan jî li hev par kirine. Ev yek jî egerek ji bo ku gelê kurd ew qas bi dûv û dirêj bindest bimîne. Ger gelê kurd bixwaze xwe rizgar bike, divêt li çand, huner û zimanê xwe

xwedî derkeve."

Piştî axaftinê ku bi tilfîyên dayikan û çepikên temaşevanan qediya, Koma Koroya Muzîka Gelê Kurd derket ser sehneyê. Koma Muzîka Gel, ji hemî xebatkarên muzîkê yê NÇM'ya Îzmîrê hatiye holê û li gorî wan, wê ew di dema pêşiyê de hîn xurt bibin. Ev kom ji layê xebatkarê NÇM'ê Ş. Şah ve tê rêvebirin. Di vê şahiyê de komê, stranên ku ji layê stranbêjên wekî İbrahim Tatlıses, İzzet Altınmeşe, Selahattin Alpay, Beşir Kaya ve li tirkî hatine wergerandin, xwendin û lê xwedî derketin. Hinek ji van stranên ev in:


Lê Dotmâm (Ben Yetim), Canê Canê (Caney caney), Welat (Bitlîsin Önünde Bağlar), Yara Min (Cumbullu) û hwd.

Dûv re Koma Dengê Bahoz, bi xwendina helbestan û listikên gelêrî, roj xemiland. Piştî Koma Dengê Bahoz, Şanoya Hêvî listika xwe ya bi navê "Nêzîktêdaneke Rîtuêl ji Dîroka Şerên Çîmî re (Sımsır Savaşım) Tarihine Ritüel Bir Yaklaşım) pêşkêşî mêvanan kir.

Her wiha NÇM'ya Îzmîrê ya pêşîn ji layê polîsan ve hatibû morkirin. Ligel vê yekê jî şaxa nû hate vekirin û xebatkarên xebatên xwe domandin. Careke din jî NÇM'ê bi vê çalakiya watedar, li ziman, çand û hunera kurdî xwedî derket û şimaqek li ser çavên dagirkeran xist.

FEREC ÇOBANOĞLU

TÎŞK



MİRHEM YİĞİT

İsa Şans

Mirov hene ne yên jibîrbûnê ne. Jibîrbûn heq nekirine. Kes hene mirov bi heyf û axîn behsa wan dike û naxwaze jibîrbûn wan daqurtîne. Şer û berxwedaneke me jî divê li hember jibîrbûnê û jibîrkirinê be. Em divê bi qasî berxwedanvanên li serê çiyân, di zîndanên de û di nav xebata rojane de li nesax û gorbuhîştên xwe jî xwedî derkevin, bikevin navbera wan û jibîrbûnê. Wan ji hûtê jibîrbûnê ku pale û alîkarekî dijmin e, biparêzin. Çekê vî şerî jî nivîsandin e, dikirandin û zikirkirina wan e. Jiyandina wan di hafîza neteweyê de ye.

Ji vê destpêkê ez dixwazim bêm ser İsa Şans. Ez di nav rûpelên kitêba 'Rojnamegeriya Kurdî' de ku ji aliyê îmzeyên Malmisaniy û Mehmûd Lewendî ve hatiye nivîsandin, li du sê cîhan li navê İsa Şans rast hatim. Di nav çend sohbetan de jî min ji hevalên farqînê navê İsa Şans bihîst û di sohbetekê jî van de ez bûm guhdarê hin agahiyên ku serê mirov bi wan bilind dibe û hin tiştan jî ku mirov bi wan diêşe û diçilmise. Di meqaleya îro de min dil heye ku ez xwendevanên xwedî enterese jî bikim pişkdarê van agahiyên.

Wî demekê mîna katib li Nexweşxaneyê Farqînê kar kiriye. Li gorî ku tê gotin roj-namevaniya wî jî hebû. Wî rojnameya "Silvan Sesi (Dengê Silvan) derxistiye û ji kovarên kurdî re jî nivîsiye.

Salên ku İsa li nexweşxaneyê kar dike, ew dizî û sextekariya ku li nexweşxaneyê heye eşkere dike û hin jî dibêjin ji ber vê yekê ew di sala 1962'an de li ser îxbarekê hatiye girtin. Di dadgehê de ji dadgerê dewleta dagirker re wiha dibêje: "Ez te muhatab nagirim. Tu ne xwedî maf î ku tu me mehkeme bikî. Em divê we mehkeme bikin, lewre yên neheq hûn in, hûn çavsoriyan dikin."

Heta wê rojê hakim tiştêkî wiha nedîtiye, dişerpilê, kef bi devê wî dikeve. Hêrs dibe, şîn û sor dibe. Rengek diçe û yekî din tê yê, nizane çî bike, çî bibêje. Dawî İsa dişîne fakulteyê ba dokorekî, da ku binêre ka İsa ne dîn û şet e.

Doktor rapora saxlem didê.

Pir heyf e ku di nav xelkê de jî hin kesan bi qedrê wî nizanibûn û heta carinan qerfên xwe jî pê dikirin. Belê wî tiştên wiha nedixistin paçê xwe. Dilê xwe nedigirt. Bi beşîş û bi devlikenî digot: "Xem nake, xort in, naşî ne, tişt nabe. Ez mîna zarokên xwe hez ji wan dikim. Tê bîra min me berê bi hev re bi dizî qise dikir, kêfa min tê ku niha xort hişyar bûne û xebat bi pêş ketiye. Li wan negirin."

Di sala 1965'an de piştgiriya Partiya Karkerên Tirkiyeyê (TİP) kiriye. Dewletê û polîsên xwe gelek caran avêtine ser mala İsa Şans, nivîsandinên wî û kitêbên li mala wî birine. Dema dewlet kitêbên wî digire, giş teniştên rûpelên wan bi notên wiha dagirtine: "Tu dewlet ji dewleta tirk bêşertir û berûmetir tune."

İsa demekê bédeng bû. Pir kesan nizanibû ku ew mirovekî welatparêz e û demekê xebat dikir. Siyasiyê di nav 'Koma 49'an' de wî nas dikin. Têkiliyên wî bi wan re hebûn. Kesên İsa nas dikin dibêjin ku ew xwendevanekî baş bû û giş kovarên piştî salên 70'yî dixwendin.

Xwendin û nivîsandina İsa bi tîpên erebî jî hebû. Ew mirovekî zana û bikultir bû. Navê 'Silvan Gazetesi' jî wî maye.

Niha sê qîz û sê kurên wî hene. Kurê çaran Şînasî Şans di nav rêzên şervanên kurd de li dora Erxenyê şehîd ketiye. Cenazeyê wî li Ferqînê hate veşartin. Bi hezaran kes hatin rakirina cenazeyê wî.

Dema İsa di nav xezanî û destengiyê mezî de serê xwe danî, temenê wî li dora 60'î, sal 1986 û dem bi ihtîmal teşrîn bû.

Rojek ji rojên biharê ya herî xweşik bû. Dengê bilbil û bayê kur bîna xweşikiyên kulîlkên biharê dabû ber xwe, gir bi gir, çiya bi çiya digerland. Stranên evîndarî yên şivanan, dengên lawirên kûvî yên li ser zinar û tehtan, çiveçîva çivîkên li asîmanan, guregura bayê kur, barebara berxikan û bêdangîya geliyên kûr û kaşên bilind, bi xulexula ava belekiyên berfê re mîna orkestrayêke siruştî can didan deşt û zozanên qedexekirî. Stêrka sor a di dilê roja zêrîn de, fistanekî berbangî li xwe kiribû. Kembereke kesk a daristanî li nava xwe ya zirav pêçandibû. Bi ser çiyayên kurd re bêbinxet û bêserxet diçirûsî.

Bêhna newrozana giran dihat. Bêhna wan çikiyabû. Ava belekiyên berfê, şêlî diherikî. Di rojêke sayî de şêlîbûna avê ne elameta xêrê bû. Deng, reng û pêjnên dûrî biharê, bi darê zorê, bi bayê başûr re li warê botî û behdînanîyan digeriyan.

Di van rojên dawîn de baş dihat xuyakirin ku dengê qebeqeba kewên heram zêdetir bûbû. Li hemberî êrişên qewmê nikulsoran bi tirarek (tedayet) bûn. Dilekî ji soringa azadiyê çeka wan a herî giran bû.

Hewtehwet û qebeqebê ji zû de dest dabûn hev. Her heft şivan di vê roja bihara xweşik de bi serma zivistanê dicemidîn. Di taldeya zinarên geliyê kûr de, ji bilûrên şivanî stranên dildariyê derdixistin û didan ber bayê kur. Li asîmanê çiksayî, ji ber şirqîniya ewrên pûk û xezebê notayên awazên kurdî yek bi yek diketin bîreke bêbinî. Ji çavên guhdarên bêzar û bêzîman xemgîniyek dibariya. Seyên wan mîna mirovên li ber dardekirîne bêçare, dikûziyan. Berê her heft şivanan jî tu maneyek nedan nihêrinên xemgîn ên guhdarên xwe.

Pişt re bilûrên xwe kirin beriya kulavên xwe û bi dilekî bi guman li dora xwe nihêrin. Na, gur ne xuya bûn. Ramanên der barê gurên tûranî de di serê wan de derbas bûn. Xofek ket hundirê wan. Ricifin. Pêşiyê wateyek nedan vê ricifinê. Sala pêrar jî wiha bûbû. Wê demê, di nêzîka wan re gurên du ling derbas bûbûn. Gurên tûranî...

Duh bi şev di yanzdehê nivê şevê de, siwarên sor li wan bûbûn mêvan. Piştî vexwarina çayên qaçax, bi hev re gelek peyivibûn. Titûna Mûşê gerdena zer a keça axê dianî bîra şivanan. Bi gotina wan, 'cewrên asenaya har', bi girêz û didanên ku xwîn jê diçilke, bi alikariya koremar û dûpişkên ji cisnê kurmên darê xwe berdane deşt û geliyên Başûr. Bi ya wan, diviyabû pêşmerge tu carî paşmergetî nepejiranda. Koma siwarên sor xwe di newalê de berdane jêr û di nav dar û beran de ji ber çavan winda bûn.

Heke talûke mezin bûya, wanê xwe bispirtana tîrêjên stêrka sor. Li ser vê jî gelekî bi hev şewiribûn. Her heft jî xwedî zar û zêç bûn. Malên wan bi kulavên wan ên şivaniyê germ dibûn. Bi dengê bilûra wan tîrê dibûn. Dema ku biçûna şer dê kê ew xwedî bikirana? Hezar pîrs û bersiv di serê wan de li bin guhên hev diketin.



Heft çivîkên çiyayî

Roj bilind bûbû. Tava rojê û bayê hênîk ê biharê bi hev re li çiyayên meidan digeriyan. Dengên di nav vîzîniya bê de, hêdî hêdî dihatin fêmkirin. Ev deng û xwediyên vî dengî bi çavên serêrên xwe jî dîtibûn. Çend hevalên wan di girêza van zindiyên pîs de xeniqîbûn. Hejmara wan tu kesî nizanibû.

Ewrên barana xezebê her ku diçûn nêzîktir dibûn. Belekiyên berfê di bin potînen reş de careke din dinaliyan. Mirina bi çekên germanî û destên tûranî nêzîktirî heftan dibûn. Artêşa mirdaran bi hemû rengên guernicayî yên ji firça Picasso, bi jehra Francomisto dest bi êrişê kirin. Ew mirovê ku hêj duh êvarê, heft darên daristanî bi meweiyên xwe tîrê kiribûn, niha bûbû kurmekî ji agir û bi canê darê ketibû. Hêj çend saet berê ji bo şitlên azadiyê, bi navê rojê sond dixwar. Heftan dê ji ku zanibûna, agirê patofê jî nîn e xweliya wan bi ber didanên bayê kur bikeve.

Dinya ye; ji hinekan re bihuşt, ji hinekan re dogeh e. Xudayê mezin jî di kitêba xwe de wiha nivîsî ye. Lê di van

salên dawîn de êdî baweriya şivanan bi gotinên wî jî nemabû. Nêçîrvanê berazan bi peyvên ji zimanê rojê di riya tariyê de, ji koremar û gurên har re dixebitî. Di daristanên bihuştê de bûbû ava bivirê ji pola. Şivanan êdî baş fêmkiribûn ku ewê jî dê bi tîrêjên sor herin warê pakrewanan. Jiyan pir caran di çûyînen bêhatin de bû li vî welatî.

Roja sor, di cihê xwe de sip û sar bûbû. Te digot qey ta girtiye. Dilerizî. Vedilist. Ji kerban digiriya. Mîna barana avrêlê hêsir ji çavên wê dihatin xwarê. Bi tîrêjên xemgîn nema gazinên xwe ji Ahûra Mazda re dinivîsîn. Xwedê zane ev cara çendan bû, hêsirên rojê ji ewrên neçar tav li pey tavê dihatin xwarê. Hêlinên keskesoran di tariya reş de bi agirê birûskan dişewitîn. Ji xewa xwe ya şêrîn vediciniqîn. Holî ser xwe dibûn. Ji heft rengan heft axîn bilind dibûn ber bi xudayekî samî ve. Lê, di dinyaya pîsitiyan de, xema kê bû xemên rojê.

Qêrîn û nalinên heftan erd û asîman dihejandin. Hinekan bi singûyan pî, ling, guh li ber rojê hişk dikirin, di zer-

fekê de ji malbata xwe re dişandin. Pîraniya mirovên wan bi lehengiya lawên xwe pesnên xwe didan.

Tariyê bi kevîran serê tîrêjên ronahiye diperçiqand. Di destan de serên jêkirî fotograf dikişand û bi serkeftineke şevreşî tûyî (tifi) mirovahiyê dikir. Hinekan tecawûzî cendekan dikirin. Yekî didanên xwe yên kevîrî di serê şivanê mirî de kiribû xwarê. Di nav çend deqîqeyan de, mêjiyê wî derxistibû. Navê wî yê kod "Kurdistan Celadî" bû. Li ser deftera xwe ya bîranîne ev nav nivîsîbû.

Di van sê çar mehên dawîn da, zewqa wî ya herî mezin vexwarina xwîne bûye. Hinekan dûmana titûnê di bedena şivanan de dişewitandin. Ji van didoyan bi partanên xwe yên li ser seriyên perçiqandî, di bin bêhna bedenên şewitî de fotografên xwe dikişandin. Yê li kêleka wan jî, goştê şivanekî nivşewitî dixwar.

Qêrînen şivanan ên ku bi dengên "Ay dayêêê axx!" û yên ku bi tîpan nayên nivîsîn, bi firçeyê nayên çekirin, reng û çixîzên resaman nikarin bînin zimên, kamera nikarin bikişînin, dilê bayê kur disot. Qêrînen ku tenê mirovê ku derdixîne û yên ku wan pê didin derxistin, zanin bi çi awayî ne... Ji devekî "Hûn kanin me bikuji, lê tu carî nikarin me bikirin" digotin.

Heftiyek bi şûn de, ji keriyê mirdaran tenê yek mabû. Wî jî her çiqas alîkarî ji lanan xwestibû jî, bi ser neketibû. Kes nehatibû hawarê. Ji ber ku gurên duling ji agirê şevê ditirsiyan. Nêdixwestin xwe lê bikin xwedî. Birîna wî zehf giran bû. Riya xwe winda kiribû. Piştî çend saetan miribû. Cihê ku lê hatibû birîndarkirin bi qasî panzdeh deqan dûrî lanê bû. Perên (pelên) deftera wî bi xwîna şivanan sor bûbûn. Bi dilo-

pên şikeftê şil bûbûn. Rûpelê dawîn jî, bi xwîna xwe sor kiribû. Di rûpelê dawîn ê deftera vekirî de, ev hevok hebûn: "Heta heft roj berê jî, ez însan bûm. Ez jî wekî we bi mirovî hatim dinyaya derewîn. Di dibistanan de jehr bi me dan xwarin, mêjiyê me bi girêza kûcîkên har şuştin. Niha, ez wekî zindiyekî genî ji vî dinyayê bar dikim. Yên ku jehra harbûnê dane min, tu yek li min xwedî dernak..."

Rûpelên şil ên defterê geh bi vî alî de geh bi wî alî de dixirxilîn.

Ji wê rojê vir da, heft stêrk dinalin di bilûrên şivanan de. Heft gul dipelîmin li gulistanê. Heft keskesor xwe dikujin bi barana buharê. Dêdara med heft kulîlkan vedike li ser goristana şehîdê bênav. Heft kulîlkên ji rengên serbestî û mirovahiyê di destên heft birayên amedî de, di bin kulavê şivanî de mezin dibin. Stêrka gelavêjê heft gulên berbangî, heft sorgulên çiyayî dide destê roja biyanî.

RAÏF YAMAN

Jujin peyveke çêkirî ye lê mebest ne jineke çêkirî ye

Pejirandina mafê jinan ji berê ve, karekî dijwar e. Bi qasî vê diwariyê jî ew karekî pêwist e ji bo avakirina jiyaneke nûjen û azad. Lewre, divê naveroka jin û jiyane biguhere.

Ji aliyê xwendekarên baldar ve (bi taybetî jî yên Bakur) tê zanîn ku di sala 1996'an de çend jinên kurd ji bo amadekirina kovarekê dixebitiyan. Di demeke kurt de jî gihîştin armanca xwe. "Roza" bi vî awayî derket pêşberî xwendevanan. Di pêşgotina kovarê de dihat xuyakirin ku ev kovar, kovareke jinên kurd e û bi îdiayên mezin derneketiye. Lê piştî 5 hejmaran, kadroyên Rozayê bi piranî (ji bilî kesekê) jê veqetiyan. Di berfanbara sala 1996'an de rojekê dişa bi awayekî bêdeng kovara 'Jujin' kete destê me. Li dijî jineke xwe nenas, jineke zana dihat pejirandin. Ew xaleke girîng bû.

Di pêşgotin kovarê de li ser sê xalan bi giranî hatibû rawestîn. Ji van a yekemîn, kovar bi nivîs, xêz û keda jinên kurd tê amadekirin; lê ji jinên din re jî ne girtî ye. A duyemîn, sedema derha-

tina kovareke nû otoritexwaziya hin kesan e. Tê gotin ku ew yek nehatiye pejirandin û wê neyê pejirandin jî. A sêyemîn jî, jinên kurd dixwazin awayê nihêrtina xwe ragihînin hemcinsê xwe û di nav civaka kurd de wê dîtin xwe bi cih bikin

Dişa di pêşgotinê de li ser maneya peyva 'Jujin'ê ev tê gotin: "Jujî semboleke ku ji bo

parasitina jinan hatiye bikaranîn. Jin jî gava ku wekî "jîn" hate pejirandin, wê "jiyan"ê temsîl bike."

Di çêkirina vê pêyvê de jî gelek manê lê hatine barkirin. Her çiqas Mameste Yakup der barê peyvê de ne wekî wan bifikire jî, bi ya min pêlîstina zimanan

ku ev çavdêriya van nebûya, haya me wê çawa ji Bob-Alî çêbûya. Ew hovîtiya hanê wê çawa bihata ber çavan. Ku nivîsa Bercanê nebûya wê çawa haya me ji jiyana û hosiyan (wesiyet) Aytenê bibûya. Gelo ew jiyana ji zilamên birêz (!) re ne wekî ders e. Ma çiroka Remê ne balkêş e? Jiyana Merivanê gelo di civaka me de ne birînek e? Tehma van nivîsa ancax bi xwedîne dikare bê girtin.

Di kovarê de tiştê herî balkêş, sivikbûn û rawaniya zimanê nivîsan e. Ev şêwe ji stîla nivîsên zilaman pêşketîtir e. Ev jî hîpoteza Engels û Morgan rast dike ku civakîbûna jinan ji ya zilaman pêştir e. Ji ber ku jin rewşê bi zimanekî nerm û sivik tînin ziman, ev yek bandoreke zêdetir li ser mirov dihêle. Belê ew xwe di vî warî de ji me zilaman baştir tînin zimên. Ev jî serkeftinek e.

Edî em bawer bikin ku Saniye, Dilşah, Canan, Hatice, Sema, H. Şevîn, Sibel, Hande, Roşa, Ruhay, Meriwan, Sebahat, Dilwîn û nivîskarên nû bi nivîsên xwe yên bi vî rengî, çirokên xwe û yên dayîkên xwe nîşanî me û xwe bidin û bi van çirokan xerabî û durûtiya zilaman û tabloya vê yekê-peşkeşî civakê bikin. Kurtasiya peyvê, wî gotibû: "Ya ku tê vegotin çiroka me û te ye".

EZNAS MAYA




her tim ji dewlemendbûna wê re îmkanaan çêdike.

Di naveroka kovarê de nivîsên gelek xweşik û girîng cih digirin. Em bi van nivîsan pê hesiyana ku "Waqfa Heinrich Böll" û "Projeya Mafên Mirovan a Jinan" li ser navê 'Piştigiriya Derveyî Sînor' civînek li Stenbolê pêk anîye û ji gelek welatan jin beşdarî civîne bûne. Dişa

Normal e

HELÎM YÛSIV



Pêlên ramanan di serê min de dilîstin dema ku dostekî min î xort (xwîngerm) derbas bû odeya min û bi hêrs got: "Tu zanî çima destê min werimiye?" Min got: "Çima?" Wî got: "Ji lîxistinê, weleh rojekê ezê hinekan bikujim, lê nizamim bê kengê ye! Normal e, normal e, normal e, weeeeo, her tişt normal e. Çi bibe yê dora te dibînin normal. Xiyane, derew, vexwarina xwîna bira, dizî. Kuştina bav an dê. Jina ku mêrê wê diçe kar û mêrekî din tîne ser cihê wî. Mêrê ku jin û zarokên xwe birçî bihêle û here bajarên dûr bide du çend çîmên spî û tazî."

Xwedan li ser eniya dostê min diherikî û digot bêyî ku li bendî destûra min bimîne: "Ev deh, dozdeh salên min in ku ez ji vê hez dikim. Bav û dê hema bi nivî zorê ew dan yekî maldar û zewicî, piştî du salan hat berdan, ez dişa lê vegeyrim; çimkî zewaca xwe û hemû êşên xwe tev de xistin stûyê min pepûkê Xwedê. Ez kirim sedema her tiştî, min jî xwest

ez dilsoz bim bi evîna xwe re, bi dilê xwe ye yekemîn re. Ev salek e em di evîneke germ de ne. Li ber min dilerizî û digot: 'Ne evîna Zînê û ne ya Julietê û ne jî ya Leyla ji ya min xurtir e.' 'Tu jiyana û dil û can û xwîna min î wilo digot. Tu zanî, bi xwîna xwe soz ji min re nivîsand ku an ji min re ye, yan jî ji axê re ye.

Zengilê telefonê lê da, ez rabûm, min dît ku ew e, hema ji nişka ve got: 'Yek tiştêk ji hezkirina te di dilê min de nemaye.' Wey ev çi ye? Telefon ji destê min ket. Min bi zorê hilgirt. 'Keçê xwîn di nav me de ye xwîn.' Dengê kenê wê derzî di guhê min de çandin û got 'Xwîn çi ye mêro, tu li çi dipirsî lo?!' Ez dîn bûm, min dest ji karê xwe berda û ez vegeyriyam welêt, hew min xwest sedemê ji min re bibêje, du saetan min û wê li ser telefonê li ber hev da û negot. Piştî sê çar rojan tu çi bibînî, min dît jinik diçe, bi dizî, dikeve bin yekî din û hetanî şevqê bi telefonê pê re ye, ji saet dozdehê şevê hetanî çarê sibehê, di eynî dema ku bi min re dipeyivî, heyloo. Di pênc rojan de ez guhertim bi yekî din û tew kêf kêfa wê ye."

Min bi paçikekî spî xwedana dostê xwe paqij kir. Dihat ku dev li xwe bike û berde-wam dikir: "Min rê girt û ez çûm cem yarikê wê, min nas kir ku diçe cem û tê, berî ku ez vegeyrim. Mêrik jî gelekî ji xwe razî bû ku, ev nêçira xweşik ketiye nav destên wî. Tew bi ser

min de rabû û digot, 'Tu paşketî yî, ev jin nema ji te hez dike û hew. Tu çima ew qas xwe dimirîni. An ez an tu, gidî ma çi qewimiye qey.'

Yabo hîn bi min re bû tu ketiyî nav me. Em rabûn hev û din, xelkê bihîst, niha îcar kî min dibîne dibêje, normal e. Kuro ez dibêjim xiyane min kir, dibêjin normal e, derew li min û li wî û li xwe û li xelkê kir. Normal e, can û dilê min tev de di nav destê wê de bûn, tev de xistin bin sola yekî din, normal e, evîn çû, xedir bi min re bû, emir wînda bû, normal e, mînkara xwîn û sozan bû, normal e, de tu bi qedrê Xwedê bikî ka bibêje çi ne normal e. Te niha nas kir çima destê min werimiye, hema bi rê de, kê ji min re digot 'normal e' min li wî dixist û min jî tîra xwe lîxistin xwar, hê de ka bêje lo, çiyê ne normal heye? Ha, tu zanî çi ne normal e, de bise ezê ji te re bêjim: Tiştê ne normal ew e ku tu ji dil hez bikî, tu rast bî, tu yekrû bî, tu xwedî şeref û bext bî, ne normal e ku tu li rastiyê xwedî derkevî. Lê tiştê ne normal û tim û tim nayê qebûl kirin li vî welatî ew e ku, tu mirov bî."

Min jî ji dostê xwe pirsî: "Naxwe normal e ez van gotinên te binivîstinim, ne?" Di cih de vegeand: "Erê erê normal e, her tişt normal e. Hew ezê ji cem te derkevim û wê destê min î din jî wê werimibe. Ew jî normal e."

Mezintirîn operasyona sedsala bîstan

Di van rojên rabûrî de çapemeniya tirk bi dilekî xweş û bi rûyêkî geş ragihand ku Meyroya tirk a ku ev serê du hezar salan e ji layê kurdan ve hatibû dîl û bendkirin, di encama operasyoneke kesî nekirî û kesî nedîtî de ji layê hêza dewletê ya neçekdar ve, ji dest zimanê kurdî hate rizgarkirin.

Ev operasyona ku li seranserî cihanê deng veda, wekî mezintirîn operasyona sedsala bîstan tê herêkirin. Wisa diyar dibe ku ev serkeftina tirkan, Operasyona Magadişo û a Entebbe ku ji layê hêzên alman û îsraîlî ve hatibûn kirin wê ji rojeva giştî ya cihanê derbixe û mirovayetî bi vê operasyonê wê xêrhatinê bide sala du hezaran.

Ji layê berdevkê qumara netewî (Millî Piyango) ve, piştî eşkerekirina egerê bingehîn ê hatina neteweya tirk ji Asyaya Navîn bo devera Rohhilata Navîn ku bidûvketina Meyro bûye. Millî Piyango, ji ber bîdestxistina Meyro, bilet li ser navê wê derxistin. Çi heyf ku di şûna Meyro de Meyno li ser biletê hatiye nivîsîn. Ka bê kîjan sebavî ev yek kiriye. Rayedarên Millî Piyango rabûn bilet bi paş ve kişandin û ser Meyno nixamtin, ku qaşo ew peyveke



kurdî bûye.

Berdevkê saziyê ji bo vê kirinê, daxuyaniyeke wiha da çapemeniyê:

“Her wekî tê zanîn Meyro, keça tirk a esil û xwişka biçûk a Asena ye. Kêm zêde berî bi du hezar salan, di şerê mezin yê ku li Newala Ergenekonê rûdabû, ji layê menxoliyan ve hatibû revan-

din û dema ku Timûrleng hate devera Kurdistanê ew bi xwe re anîbû. Di vegerê de Timûrleng wê li Kurdistanê ji bîr dike. Kurd jî ji bo kurdîkirina Meyro gelekî dixebitin û li derdora Bîngolê ku navenda çanda gelêrî ya kurdan e wê desteser dikin û navê wê jî diguhe-
rin dikin Meyno! Ji wê rojê de ye ku

gelê tirk ji bo dîtina Meyroka xwe li tevaya cihanê bêserî digere. Egerê çûna me heta bi dergehên Viyena û dagîrkirina bakurê Afrîkayê hemû bi mebesta dîtina Meyro bû. Heger na, ma çi îşê me li wan deveran hebû?!”

Piştî barandina çend rondikên germ û yên şahiyê, berdevkê qumara netewî axaftina xwe wisa bi dawî anî:

“Tarîx şahidê me ye. Ji bo ku em Meyroka xwe ji bîr nekin, me navê wê li qumara xwe ya neteweyî danîbû. Piştî lêgerîn û liduvçûneke dûr û dirêj ya salane, û piştî pêkanîna gelek bizavên tund yên qirkirinan, dawiya dawî li derdora Bîngolê şewitî em pêrgî Meyroka xwe bûn. Me dît ku kurdan navê Meyroka me kirine ‘Meyno’.

Her çende waliyê Bîngolê daxuyakirin ku peyveke wisa di zimanê kurdî de tune ye jî, lê em baş dizanin ku ji layê hinek xayînen cudaxwaz ve, bi mebesta windakirina Meyrokê navê wê hatiye guhertin.

Digel rabûrîna du hezar salan bi ser dîrkeftin û cudabûna ji Meyro, di encam de em gehîştin Meyroka xwe ya ku bi hezaran sal e kurd berî me pê kar dikin. Em şad û bextewer in.”

NAVENDA DEREWAN

BIXELAT...

XAÇEPIRSA BIXELAT (58)

XAÇEPIRSA


Ş	E	R	E	D	A	N	E	S	E	L
R	A	N	A	A	B	O	R	T		
S	E	M	A	S	T	E	N	A	M	
F	A				A	R	E	N	H	
T	K	N	A		E	V				
E	J	J	W	H	R					
E	N	C	A	M						
D	A	N	A	S	T	N				
D	J	N		R	E	N				

Bersiva Xaçepirsa 56'an


Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 58'an pirtûka

INCÎLA LUQA ye
Jêrenot:


Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn “Peyva Veşarî” di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.



Ne buha	Darek Nexweşîne ke zarokan	Merasim	Dîn	Devera Farqinê	Havingeha koçeran
Şehidek (wêne)		Neptûnyûm	Welatekî cîran	Dê, dayik	
Cot, diji ferê Navçeyeye Sêwazê		Kal Pêşnavê yezdan Mazda		Dengekî fina telefonê	
		Xwarina sereke		Bi tirkî şop	
Nika, nûka		Pîştevan	Navê rojekê	Beyreq	
Fosfor	Heşaretêk Bajarek		Paşnavê Memo	Şên, ne xerabe Neteweke kevnar	
		Navekî keçan	Êş, azar		
Rewşen		Nav			
			Dêm		
			Qertafeke pirsê		
Baneşanek Bextewerî, seadet		Ferman-dar			



PEYVA VEŞARÎ





Yekîtiya Hunermendên

Yekîtiya Hunermendên Kurdistanê li Kôlna
Almaniyayê hate damezirandin. Ji bo heyeta
rêveberiyê neh kes hatin hilbijartin.
Prof. Qadir Dîlan jî bû serokê yekîtiyê.

Kurdistanê ava bû

Li Kôlna Almaniyayê roja 1-
2.03.1997'an bi bêşdarbûna hu-
nermendên ji her çar parçeyên
Kurdistanê, Konferansa Yekîtiya
Hunermendên Kurdistanê hate lidarxistin.
Serokê PKK'ê jî mesaj şande konferansê

Konferansê roja şemiyê bi axaftina Prof.
Qadir Dîlan dest pê kir. Dîlan di afatina xwe
de bal kişande ser rewşa hunermendan û dek
û dolapên dijminan ku çawa kurd xapandine.
Prof. Dîlan axaftina xwe wiha dom kir: "Lê
îro fersenda ku me girtiye pêwîst e ku em qet
wê bernedin. Hemû îmkânên me hene ku em
van fersendan bixin riya şoreşa xwe, wê de-
mê em dikarin hunermendiya xwe bidin xu-
yakirin. Dijminên me kurdan ne yek e û ne jî
ji aliyekî ve êrişî ser me dikin. Di hemû hê-
lên jiyane de tene ser me. Ez hêvîdar im ku
ev konferansa me wê ji me re bibe bingehek
ji bo yekîtiya neteweya me."

Qadir Dîlan li ser rola hunermendan jî ev
gotin: "Gava mirov li şoreşên gelê cihanê di-
hêre, dibîne ku di hemû şoreşan de rola hu-
nermend pir girîng e. Divê em jî xwedî li ro-
la xwe derkevin û ji bo azadiya kurd û Kur-
distanê çî ji destê me tê, bikin."

Nûnerê Yekîtiya Ezdiyên Kurdistanê Şex

Xelef jî di konferansê de axivî. Di axaftina
xwe de bal kişande ser girîngiya Konferansa
Yekîtiya hunermendên Kurdistanê û diyar kir
ku tiştê herî girîng îro ew e ku ji her çar par-
çeyên Kurdistanê hunermend berhev bûne û
li ser pirsgrêka kurd û Kurdistanê diaxivin.

Di konferansê de Huseyin Kaytan jî, kur-
tesemînerê da. Kaytan der barê rewşa Kur-
distanê de hin agahî dan û li ser hunermen-
dan jî ev tişt gotin: "Heta îro dewleta tirk bi
xortbûna xwe ya dijminayiyê li dijî gelê me
quweta xwe dide meşandin. Hunermend ne
wek kesekî polîtîk e, lê jiyana wî bi polîtîka-
yê ve girêdayî ye. Ji ber jiyana bêşoreş nabe,
pêwîst e em jiyana xwe ya şoreşgerî û huner-
mendî baş binirxînin da ku em zanibin huner
çî ye?"

Huseyin Kaytan da xuyakirin ku divê hu-
nermend bi xaka xwe, bi şoreşa gelê xwe û
bi hunera xwe ve girêdayî be. Kaytan der
barê rola hunermend de jî, ji şoreşên gelên
din minakên balkêş jî pêşkêş kirin. dikim.

Pişt re mesaja Serokê Giştî yê PKK'ê Ab-
dullah Öcalan ku ji konferansê hatibû, hate
xwendin. Öcalan di mesaja xwe de li ser pîr-
sa kesayetî ya hunermendê disekine. Öcalan
wiha dibêje: Di vir de mirov tiştêkî dibîne

ku dijmin li ser dil û mêjî zoreke mezin me-
şandiye. Niha em dinêrin di nav gelê kurd
de hunermendê xort çênabin, di her alî de pir
biçûk mane.

Hunermendên me heta niha dixwestin
xwediyê dilê gel bin. Di her hêlê de çiqas hu-
nermend derdikevin, mirov dinêre ku ji bo
dijminan di karekî mezin de ne. Li ser vê jî
bi xurtî divê bê sekinandin, di vir de jî mirov
divê li ser xwe bi awayekî rexneyîbisekinê.
Eger ew rexne neyê kirin, em nikarin bibin
xwediyê hunera mezin."

Mesaja PKDW'ê jî, li ser navê Parlemen-
toyê ji aliyê M.Emîn Pencewînî ve hat
xwendin. Di mesajê de dihat gotin ku Parle-
mento tevî hemû derfetên xwe piştgiriya
konferansa yekîtiya hunermendan dike.

Di dawiya konferansê de Yekîtiya huner-
mendên Kurdistanê hat damezirandin. Ji bo
komiteya birêveber hilbijartin hate çekirin û
neh kes hatin hilbijartin. Ji nav neh kesan jî,
ji bo serokatiyê Prof. Qadir Dîlan hat hilbija-
ritin.

Di dawiya konferansê de hunermendê bi
nav û deng Aramê Tigran jî, bi stran û kilam
ên xwe renegekî cuda da konferansê.

Î. CAN DILBİRİN/ KÖLN

Ferhengok

berendam: berbîjar, navkirî, namzet
çilkîn: dilopkirin
derfet: îmkân
derûn: nefs, ruh, psikolojî
derûnî: nefsi, ruhî
dêdar: celebek dara berûyê
heman: eynî (aynî)
hêvotin: perwerdekirin (eğitme)
hêvotin: perwerde (eğitim)
holbûn: hilpekîn (fırlamak)
holkirin: hilpekandin (fırlatmak)
kîvkarîk: karok, kiwarîk, fiqeroşk
kûz: calabak kûp, den
lan: hêlîn, cihê heywanên kuvî (in)
mehû: cadî, cazû

metel: heyirî, seyr, ecêb
metelbûn: heyirîn, şaşbûn
metelmayî: şaşmayî, ecêbmayî
merez: nexweşîn (hastalık)
merezdar: nexweş nesax, xiste (hasta)
parîxwer: kurtêlxwer, loçek
parzandin: dawerivandin, palandin
parzîn: dawerivîn, palîn
pelimandin: çilmisandin, tewifanidin
pelimîn: çilmisîn, tewifîn
peyderpey: peyapey, berebere
riha: felat, rizgar, xelas
rihabûn: filitîn, rizgarbûn, xelasbûn

rihakirin: filitandin, rizgarkirin
şotin: şevitandin
şixul: kar, îş
teşe: şewe, dirûv, biçim, şekl
teşegirtin: dirûvgirtin, şekilgirtin
tevbûn: kutabûn, xelasbûn, qedîn
tevakirin: kutakirin, qedandin
tirarek: tedarek
tomar: qeyd (kayıt)
tomarbûn: qeydbûn
tomargeh: studyo, cihê qeydkirinê
tomarkirin: qeydkirin
xixilandin: libitandin, leqadin
xixilîn: libitîn, leqîn
yexgirtî: hevğirtî, standart

Jin bi şoreşê digihîjin mafên xwe

Jin bi şoreşê digihîjin mafên xwe. Li welatê me jin êş û azareke giran dikişînin. Kes wan nabihîze û nabîne, lê her kes van dîmena hema hema her roj dibîne, wekî jinên ji bo parîyek nan di nav heriyê de digevizin, yên ku di mala xwe de bi rojan birçî dimînin û yên din... Ev dîmen li aliyekî, ji dîmena giştî tê fêmkirin ku jinên li welatê me ji bo parastina rûmet û kesayetiya xwe li ber xwe didin.

dîsa rojê ku bûye simbol hat, wê di vê rojê de bi çalakî û xwepêşandanek wekhevîya jin û mêran wê bê xwestin. Lê rastiyeke ji heye ku ew roj çiqas sembola wekhevî û têkoşîna bi hev re be jî, piştî wê rojê her tiştê jibîrkirin. Rêxistinên ku bi taybetî mafên jina diparêzin hin tiştan nabînin an jî rêxistinên wan pir qels in. Wekî ku tê zanîn li çil cihên dinyayê şer didome; şerek ji wan jî li Kurdistanê ye, lê heta vê gavê ji bo rawestandîna şeran an jî ji bo mafên wan jinên di nav şer de ji bilî çend rêxistinên wekî Komeleya Mafên Mirova û Rêxistina Efhîyê ya Navneteweyî kesî tiştek nekiriye û negotiye.

Li welatê me jin êş û azareke giran dikişînin. Kes wan nabihîze û nabîne, lê her kes van dîmena hema hema her roj dibîne, wekî jinên ji bo parîyek nan di nav heriyê de digevizin, yên ku di mala xwe de bi rojan birçî dimînin û yên din... Ev aliyekî, ji dîmena giştî tê fêmkirin ku jinên li welatê me ji bo parastina rûmet û kesayetiya xwe li ber xwe didin.

Li her welatî, li her deverê dinyayê hin jinan jin bo mafên xwe yên însanî têkoşîneke dîr û dirêj dane, lê piştî şer, serhildan û şoreşan bûne xwediyên hinek mafan. Têkoşîna jinan ji bo mafên xwe



di sedsala 18'an de bi hin çalakîyên biçûk û balkêş dest pê kiriye. Ev çalakî jî ji aliyê jinên kedkar ve hatine dest pê kirin, wekî li Newyorka Amerîkayê cara yekemîn hin jinan ji bo mafên xwe yên bingehîn xwepêşandanek li dar dixin. Roja 8'ê adarê piştî 50 salî bi pêşengiya Clara Zetkîn di Enternasyonala Yekemîn de wekî 'Roja Jinên Kedkar' hate îlan kirin. Ev roj ji aliyê Neteweyên Yekgirtî (BM) ve wekî 'Roja Jinên Cîhanê' hate binavkirin.

tiye qebûlkin. piştî Şerê Cîhanê Yekemîn di sala 1918'yan de mafê jinan a hîl-bajartin û di bûrokrasiyê de cihgirtinê hatiye qebûlkin. Li welatê îskandinavyayê wekî Danîmarka, Holanda, Fînlândiya û Swêdê îro jin ji %33'yan zêdetir di polîtîkayê de cih digirin. Tiştêkî balkêş jî, li Îranê hejmara jinên polîtîkavan ji ya jinên Tirkiyeyê zêdetir e.

Mîna ke herî balkêş jî ev e ku li Tirkiyeyê heta salên 1988'an pir hindik jinan di bûrokrasiyê û di polîtîkayê de cih digirtin an jî cih didane wan, piştî ku li Kurdistanê gerilayên PKK'ê yên jin dest bi şer kirin, cihgirtina jinan di bûrokrasiyê û polîtîkayê de zêdetir bû. Partiyên wekî SHP, DYP, ANAP zêdetir cih dane jinan, ango berê van partiyên kota danibû ser jinan ku di partiyên wan de cih bigirin û beşdarî siyasetê bibin.

Şoreşa li Kurdistanê bi awayekî hem jinên tirk û hem jî jinên kurd di warê xwedî derketina mafên xwe yên bingehîn de hişyar kirin. Bi çalakîyên xwedîdayî jinên wekî Zeynep Kınacı, Leyla Kaplan û Güler Otaçê jî careke din da xuyakirin ku jin civakê de dikarin bi qasî mêran heta ji mêran akîf li welatekî wekî Tirkiyeyê li mafên xwe xwedî derkevin, biparêzin û bibine mînakên berxwedanê. Li ser vê yekê bi mabesta roja 8'ê adarê me ji hin platformên ku amadehiyê roja 8'ê adarê dikin dîtînin wan pirsî.

Şoreşa Kurdistanê çi tesîr li ser jinên kurd û tirk kir û mabesta roja 8'ê adarê çi ye?

Li ser navê platforma jinên HADEP'ê Rabia Tekaz wiha bersiv da: "Li tu derê dinyayê jin biryara şer nastînin yên ku herî zêde êşa şer dikişînin jî jin in. Civaka kurd civakeke lipaşmayî ye, mebesta me ev e ku em bi çalakîyên xwe jinan hişyar bikin û çawa jin dikare di şer û şoreşê de cih bigirin, di pêkanîna aştiyê de jî roleke girîng li ser milê wan e. Di partiya me de jin bi her awayî di rêveberiyê de cih digirin, ev jî ji aktîfîbûna wan tê."

Li ser pirsgirêkên jinan jî Tekaz wiha axivî: "Pirsgirêkê jinan li her derê hene, armanca roja 8'ê adarê jî ev e ku bi hin çalakîyan ev pirsgirêk derkevin holê û zêdetir jin hişyar bibin. Şoreşa jinên kurd jî ji vê pirsgirêkê tê, helbet şer tesîra xwe li ser kesên ku li wî welatî ne wê nîşan bide, îro ya ku li Tirkiyeyê tê dîtî jî ev e."

Ji Weqfa Hiqûqê ya Lêgerîna Civakî (TOHAV) Parêzer Ümihan Yaşar jî wiha bersiv da pirsra me: "Pirsgirêka jinan ya herî mezin li welatê me şer e. Di civakên bindest de jin du caran bindest e. Jinên kurd sewiyeya zanîna wan kêm e, bi taybetî jinên kurd hem di mala xwe de li hemberî serdestiya mêran têdikoşin hem jî di nav civakê de. Roja 8'ê adarê bi xwepêşandana jinên kedkar derketiyê holê, ev roj sembola azadiyê ye û roja jinên kedkar ê dinyayê ye ne rojê jinên femînîst e û ne jî rojê jinên bûrjûwaziye. Helbet şer bandora xwe li ser civakê nîşan dide, tabloya ku li Tirkiyeyê tê dîtî dinê jî ev e."



Piştî gelek şoreşan wekhevîya jin û mêran di zagonan de cih girtiyê û hatiye deklerekirin ku, jin û mêr di her warê jiyandê de wekî hev in. Mînak: Piştî Şoreşa Fransayê sala 1789'an di 4'ê gelawêja 1792'an de di zagona Fransayê de wekhevîya jin û mêran hatiye pejirandin. Her wiha di şoreşa oktobê de jî bi eynî mabestê li Sovyetê mafê wekhevîya jin û mêran hatiye qebûlkin. Di sala 1870 bigire, heta piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn sê caran ji bo ku jin jî mafê hîl-bajartinê bi dest bixin serî li Kameraya Lordan xistine, ew yek lê neha-